

## Wekî kaniyê diherike

Îro jinên kurd ji jinên tevahiya cîhanê re jêdera hêz û îradeyê ne; jina kurd rêya xilasiya ji tarîtî, koletî û guhertina hişmendiya hezar salan dide diyarkirin. Bi şerê li hember hişmendiya mêr dixwaze hebûna xwe biparêze... ***Sorgul Şêxo / R.2***



## Zêmarên rojê

...û bi kulmeke agir çûm ber derî, sê caran min deng lê kir, sê caran min li derî xist. "Ez im ew kes, şîreta dadê, zêmarên rojê me." Ew ê li pişt derî; deng nekir, agirê di sînga min de kêm nekir. Nekir xem û venekir derî... ***Yildiz Çakar /R.5***



## Her meh romanek

Xwendevanên ezîz, pêşî ez ji rojnameya Xwebûnê re spas dikim ku ez ê tê de mehê carekê der barê romaneke kurdî de dîtinên xwe binivîsim, romanê şîrove bikim, binirxînim û bidim danasîn... ***Lokman Polat / R.5***


# xwebûn

26 COTMEH -1 MIJDAR 2020 HEJMAR: 45 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org


# Diyaloga navbera kurdan dê bidome

Diyaloga kurdî-kurdî ya di navbera ENKS'ê û PYNK'ê de herî dawî bi boneya hin xalên ku li hev nekirin de sekinî. Der barê mijarê de Endamê Desteya rêveber a PYD'ê Aldar Xelîl û nûnerê ENKS'ê Şelal Gedo axivîn. Aldar Xelîl destnîşan kir ku ENKS ji bo razîkirina dewleta tirk li dijî perwerdeya kurdî û pergala hevserokatiyê derdikeve. Şelal Gedo jî wiha got: "Hevdîtinên di navbera ENKS û PYNK'ê de wê bidomin. Diyalog niha hinekî westiyaye lê di wê baweriyê de me ku ne dûr e, serê meha bê dê gûftûgo bidomin."... ***R.6***



## Li ber çavê her kesî kuştin

Çend roj berê li navenda Amedê jina bi navê Melek Aslan (24) ji aliyê birayê xwe ve bi awayekî hovane hat qetilkirin lê tişta balkêş ew bû ku ev jina ciwan li cihekî qelebalix hat qetilkirin ku tu carî polîs jê xalî nabin. Ji bo çi min bal kişand vê, ji ber ku rewş hatiye wê astê êdî mêrê ku hêza xwe ji polîtîkayên hikûmetê digirin û xwe wek 'notirvanê' namûsa jin û civakê dibînin, bi tu awayî hewceyî bi veşartina tu tiştan nabînin. Ji ber dizanin ev pergala ku bi her awayî wan diparêze û qanûnan li gorî wan diguherîne, ceza nade wan berovajî wan xelat dike. Melek tenê mînakeke biêş e. Her roj li Kurdistan û cîhanê bi dehan jin tên qetilkirin. Êdî mêr kuştina jinan ji rêzê û ji bo xwe wekî maf dibînin. Mêr û pergala ku pê xwedî dibe, li hemberî jinan ewqas bi kîn in ku bifikirin kesên bi zanebûn û yan jî bi şaşî alîkarî bide jinan, jinan ji tundiya mêr biparêze û nehêle qetil bike jî dikin hedef... ***R.2***

## Mafê jiyanê ne tenê ji bo mirovan e

Endamên Veganên Kurdistanê Heyat Goren û Serhat Tek ji rojnameya me re axivîn. Veganan diyar kir ku mafê jiyanê ne tenê ji bo mirovan pîroz e û wiha gotin: "Ji bo jiyaneke xweş û azad berî her tiştî hewce ye em dev jê kuştina ajalan û dev ji talana xwezayê berdin. Xweza ji bo hemû candaran qadeke hevpar e, hêvî dikim hemû mirovahî vê rastiyê bibîne, li gorî vê rastiyê jiyaneke nû ava bike..."
***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi / R.4***

## Di baweriya yarî de jin[2]

Yek ji baweriya bingehîn a ola yarî jî ew e ku ruh di bedenên cihê de 'Donadon' yan jî bi çerxêşa ruh û bi rêya vê; ruhek di rêya gerdûnê de gelek jiyanên cuda ezmûn dike û ev yek jî bi wê re têkildar e. Ji bo wê jî yarsanî di vê baweriyê de ne ku her rastî û ruh di cîhana ser rûyê erdî de lazim e dîsa pêk bên...***Zehra Mohammedzadeh / R.2***

## Hêrs û berxwedêrî

Gava li ser hêrsa dilê mirovan difikirim, ez careke din fêm dikim ku kapîtalîzm hêrs ji xwe re kiriye wek çekê.Ji ber çi ez vê dibêjim? Ji ber ku kapîtalîzm reqabet e û reqabet jî berê mirovan dide jiyaneke şexsî. Em dikarin bi rehetî bêjin ku ev hesta hêrsê lîstokeke kapîtalîzmê ye.Kapîtalîzm, dixwaze em bibin hêsîrê hêrsên xwe û di nav jiyaneke şexsî de dûrî civakbûnê bijîn. Ji ber vê mirovên bihêrs li pey hêrsên xwe diçin û ruhiyeteke metayî wan dorpêç dike.Ew di vê dorpêçê de difetisin. Her bihêrs dibin kapîtalîzm dibe dûpişk û bi wan vedide; bi jahra xwe wan qirêj dike û berê wan dide hêrseke din. Ev jahr dike ku mirov xwe nas neke. Ev hesta ku kapîtalîzmê bi mirov şîrîn kiriye, rêya xwenasînê li ber mirov digire. Berê me dide tarîtiyê û hesteke pûç bi xwe re tîne. Piştî mirov li xwe hay dibe û dixwaze xwe bibîne, dibîne ku bê hêrsê çi bi serê mirov de aniye ku êdî ev hêrs dibe nexweşiya kompleksê. Mirov ji hesta hezkirinê dûr...
***Kadîr Stêra / R.8***

## Kapîtalîzm werdê ma reyde kay keno

Sîstemê ked-werdoxan mîyan de kapîtalîzm, herî peynîyê û herî bêwijdan o. Çimkî kapîtalîzm civak bêqewet û bêtakat verdeno. Sermeyadarî her tim wazenê hukmê xo civak ser o berdewam bikerê, semedê eno berdewamîya xukmî zî şer, veyşanîye, feqîrî kenê qeder dekenê vernîya civakî. Eno sîyasetê înan zî merdiman hertim beno verva qedêneyîşî... Meqsedê kapîtalîzmî tena karkerdin o, coka zî nirxê ke merdimayî heta enka dest nevistînê, dest fîneno. Kapîtalîzm dest visto werdê ma zî. Hem zî werdê esasî nan... ***Mahîr Uzmer /R.9***

## Cayêko qedîmî ra merdimêko qedîm

Bajaro qedîm merdimanê qadîman ano dinya. Qederê cayan qederê merdimî dîyar keno. Tahîr Elçî zî şaristanêk kan û qedîm yê Mezopotamya de ame dinya. Ziwanê ci zî ziwanêk tewr kehen bî. Kal û pîrê welatê ci raştê çend qirkerdişan ameyî û înan ser de koçkerdiş ame ferzkerdene. Kam se vano wa vajo welat zehf şîrîn o. Ne qirkerdiş û ne zî ters eşkenê merdiman welatê xo ra dûrî bikerê. Kek Tahîr zî welatê xo de merdimêk welatparêz bî. Ziwanê dayika xo ra zehf heskerdêne. Hertim zimanê xo qalî kerdêne û qalîkerdişê ziwanê xo ra zehf heskerdêne. Labelê çi heyfo ke ziwanê ci qedexe bî. Bindestîya zimanê xo qet qebul nêkerdêne. Coka ra sey kal û pîranê xo serewedartox bî. Serewedartoxî timî kewto para kurdan. Serewedartoxîya ci o kerd raywanê rayîrê heqîqetî. No raywan timî heqîqatî gêra. Hewnanê xo de daxî bi ziwanê xo qisey kerdêne la wexto ke şîyêne mekteb nêeşkayêne ziwanê xo qalî bikero. Coka ra nêwaştêne ke şêro mekteb û bêzerrî mektebê xo qedêna. Dima ra zî dest bi gure kerd.... ***Cemîle Turhalli / R.9***




## Bîranîn bû sedema yekrêziyê

Di salvegera wefata helbestavanê kurd Cegerxwîn a 36'emîn de li Qamişloyê bernameya bîranînê hat lidarxistin. Îsal mîna salên berê nebû û hemû aliyên kurd bi hev re merasîma bîranînê li dar xistin. Bernameya bîranîna Cegerxwîn bû sedema yekrêziya kurdan... ***R.11***

# Wekî kaniyê diherike...



Sorgul Şêxo



Ruxmî ku ziman, îrade, hebûn û nasnameya wê di nav civaka paşverû de şerm dîtin û bi wê dan qebûlkirin, dîsa jî dikarîbû di sancoyên pêkhatina Şoreşa Rojava de, serî hilde. Ew jina kurd bû pêşenga şoreşê û avakera jiyana azad, polîtîk û demokratîk.

Hêz û hişmendiya ku xwestin qêrîna wê ya ji bo jiyan û welatekî azad ava bike qut bikin, bi ser neketin; ji ber ku qêrîna azadiyê ji tarîtiyê û bêdengiya dibe ku dîrok neletê lê bîne bihêztir û bilindtir bû. Bi qêrîna berxwedanê û têkoşîna sedsalê pêşeroja zarokan ronî kirin, xewnên hevrêyên xwe yên şehîd pêk tînin, xewn û xeyalên bi dehan malbatên ku dixwazin aram bijîn, bi cih tînin. Jina kurd ji ew kelemên li pêşiya wê hatine çandin yek bi yek li hember wê şer dike û gavên ber bi xwebûna xwe ve diavêje.

Îro jinên kurd ji jinên tevahî cîhanê re jêdera hêz û îradeyê ne; jina kurd rêya xilasiya ji tarîtî, koletî û guhertina hişmendiya hezar salan dide diyarkirin. Bi şerê xwe yê li hemberî hişmendiya civakê û ya mêr dixwaze hebûna xwe ya wekî jin biparêze da ku di serdema 21'ê de bibe nimûneyeke berbiçav ji her zindiyekê re. Dema ku mirov li çavên jinên kurd ên şerker dinêre, asta hêviya serkeftinê û azadiyê dibîne. Di ronahiya çavên wê de xweşikbûna ruhê wê yê azad tê xuyakirin. Ji mirinê jiyaneke nemir û birûmet diafirîne.


Dagirker ne tenê ji hêz û îradeya wê, ji awirên wê yên mîna şûran jî ditirsin. Dema ku dengê şervaneke kurd dibihîsin çongên wan li hev dikevin û dilê wan dilerize! Ev jina kurd e ku bi şerê xwe yê li hemberî dagirkeran, ramanên xwe yên azad ku civakê pê perwerde dike û hezkirina xwe ya ji axa welatê xwe û hevrêyên xwe yên şehîd re, di dilê dijmin de mîna bombeyekê demdirêj e û her di nav wan de diteqe. Rêxistiniya jinên Rojava ji başûrê Kurdistanê zêdetir bandorê li bakurê Kurdistanê dike. Sînor di navbera wan de hene lê mejî, fikr û ramanên wan yek in.

**Ruhê neteweyî**

Çawa ku tiliya mirov dibe birîn bandorê li tevahiya bedenê dike, her wiha jinên Kurdistanê jî wisa in. Êrîşê Rojava tê kirin Bakur dengê xwe bilind dike, êrîş li Bakur tê kirin Rojava piştgiriyê didê; ev ruhê neteweyî ye. Bi vî ruhî wê gelek xewnên dapîr û bapîrên ku li benda yekitiya gelê kurd in, pêk werin.

Ew bayê ku îro li Rojava li rûyê me dide û em bêhneke azad dikişînin hundirê xwe yê şewitî, bi saya hevrêyên me yên şehîd in; bi saya Arîn Mîrkan, Rêvana û Barîn, Zehra û Zîn û Zîlanan e, Dilîşan û Avestayan e. Ew keziyên gulîmorî yên hinekirî xweşikbûna ruh û hevgirtina jinan di rûyê dijmin de dide diyarkirin. Jin li ku derê be jiyan, xweşikbûn, afrînerî, rêxistinbûn, azadî û ronahî li wir e. Wê her wekî kaniyê biherike, li ciyekî nesekine û wê tu bendav nikaribin herikîna wê asteng bikin.

Kanî namiçiqe, her xwe nû dike û pê re xweza, derdor û cîhan şîn jî dibe.




# Pergal dikare ji rewşa heyî hîn hovtir be!

Navenda Nûçeyan

Çend roj berê li navenda Amedê jina bi navê Melek Aslan (24) ji aliyê birayê xwe ve bi awayekî hovane hat qetilkirin. Tişta balkêş ew bû ku ev jina ciwan li cihekî qelebalix ku tu caran polîs jê xalî nabin hat qetilkirin.

Ji bo çi min bal kişand vê? Ji ber ku rewş hatiye wê astê êdî mêrê ku hêza xwe ji polîtîkayên hikûmetê digirin û xwe wek 'notirvanê' namûsa jin û civakê dibînin, bi tu awayî hewceyî veşartina tu tiştan nabînin. Ji ber dizanin ev pergala ku bi her awayî wan diparêze û qanûnan li gorî wan diguherîne, ceza nade wan berovajiyê vê wan xelat dike.

Melek mînakeke biêş e lê her roj li Kurdistan û cîhanê bi dehan jin tên qetilkirin. Êdî mêr kuştina jinan wek hobiyê dibînin; kuştina jinan wek maf dibînin û kuştina her tiştî!

Mêr û pergala ku pê xwedî dibe, li hemberî jinan ewqas bikîn in ku bifikirin kesên bi zanebûn an jî bi şaşî alîkarî bide jinan, jinan ji tundiya mêr biparêze û nehêle qetil bike jî dikin hedef. Em dikarin vê bi mînakekî şênber bikin.

Salek berê li Stenbolê ciwanê bi navê Kadîr Şeker dema xwestibû jina bi navê Ayşe Dirla ji tundiya mêrê bi navê Ozgur Duran xilas bike, bi şaşî bûbû sedema mirina wî. Li wî ciwanî cezayekî giran hat birîn. Pergal vî cezayî ji ber bûbû sedema kuştina mêrekî neda, ji ber ku jinekê li dijî mêrê serdest parastibû û alîkarî dabû jinê ceza kir.

Armanc ne ew e ku jin ji aliyê mêran ve bên parastin; armanc nîşandayîna rûyê hov ê pergalê ye. Bifikirin pergala ku li hemberî mêrekî wisa be dê li hemberî jinê çawa be?

Tişta ku dixwazim bêjim ev e: divê jin saniyekê jî di hiş û bîra xwe re 'pergala mêr evqas ne hov e' derbas nekin. Pergala mêr dikare ji rewşa heyî hîn hovtir be û ji bo pêkanîna hovîtiya xwe tu pîvanan nas nake.

Bi kurt û kurmancî, çend roj berê di şexsê Melekê de hemû jin hatin qetilkirin û divê jin tu carî baweriya xwe bi pergala mêrê serdest neynin ku ew her tim dixwaze jinan bi hovîtî qetil bike.



Zehra Mohammedzadeh

# Di baweriya yarî de jin[2]

Ola yarî ku li çar goşe, li rêzeçiyayên Zagrosan dest pê kir û peyama xwe li gerdûnê belav kir, xwedî baweriyek qedîm a kurd e ku di nav dilê çiyayan de bilind bû û bingeha bawerî, îbadet û çandeke bihêz avêt.

Yek ji baweriya bingehîn a ola yarî jî ew e ku ruh di bedenên cihê de 'Dona-don' yan jî bi çerxêşa ruh û bi rêya vê; ruhek di rêya gerdûnê de gelek jiyanên cuda ezmûn dike û ev yek jî bi wê re têkildar e. Ji bo wê jî yarsanî di vê baweriyê de ne ku her rastî û ruh di cîhana ser rûyê erdî de lazim e dîsa û dîsa pêk bên; di hezar û yek don an jî çerxênî re ruh xwe biguherîne û di her qonaxa peresînê de bibuhire. Bi vî rengî, di dawiyê de û li gor nêrandina wan dost an jî xweda ku pîroze dikarin xwe bigihîninê. Ji bo wê, di vê olê de nêzîkatî û tevgera mirov a bê pejirandin li ser bingeha ku bi tevahiya mirovan re bi awayekî dostane û li ser esasê hurmetê têkilî pêşxistine. Di her şert û mercî de exlaq û fikirîna tiştên baş girîng e.

Bêguman di vê baweriya ku li ser wekheviya di navbera jin û mêr de ku ji destpêka gerdûnê ve wiha digire dest û dinirxîne, me di nivîsa beriya wê de jî dabû diyarkirin, girîng e. Yarsanî ku xwe beşek ji vê cîhanê dibînin, xwe jê cihê nakin û ew di vê baweriyê de ne ku di vê ola pîroz de, ji nîvî zêdetir şopdar û pêşengê vê olê jî ji jinan pêk tê.

Kake Abdîn, yek ji pêşengê vê baweriyê jî bi wan gotinan balê dikişîne ser wekheviya di navbera jin û mêran de;

*Şemdanem awerd nakoy ferqanî*
*Pey soçiyan nûr erwahûgiyanî*
*Ta Çîn û Maçîn coft bî mîzanî*
*Bîm û ferzendeşan namîm sîfanî*

Ew dibêje; navê diya min Nekîsa û navê bawê min Sefyan e. Niha dixwazim şahidiya ebedî vebibêjim. Li Dîcortarê navê min Kilîm bû û beriya adem navê min Emdan bû. Me mala Maçîn (jin) ji bo bi Çîn re peyman deyne ava kir. Ji bo ku li mala wê ronahî hebe, min ji çiyayê ferqan ji bo wê şemdan anî da ku bi pêxistina findê ruh di bedena wan de tam bibîne. Maçîn û Çîn ku xwedî maf û heqê wekhev bûn bi hew re weslet çêkirin û ji vê wesletê ez çêbûm.

Wek em di vê metnê de jî dibînin, hebûna jinê hîn ji destpêka gerdûnê de li ser wekheviyê û heya beriya adem û hewa tê birin. Li vir jî tê dîtin ku jin ne jî adem, ne jî di wê demê de giyan pê dikeve, yanî ew xwliqkarê mirovahiyê ye, a zayînê pêk tîne.

Kak Heyder Dehlekî jî yek ji axaftvanê deme Perdiyor e, bi rêzdariya maf û wekheviya jin û mêr dest bi xwenasîna xwe dike û dibêje; "Beriya ku qalibê însan çêbibe navê min Bedrek bû. Dûvre dîwana fanî ku tije durûyî bûn tê avakir. Çar hêman te ji çar şahbanûyan ava kirin û ji bo lêanîna bedenê însan di qalibê hatî çekirin de, te bi cih kir. Piştre ji bo ku însan kamil bibe, ji pîr Bonyamîn erkan, ji Davod Kosewar edeb, ji pîr Mûsa eqil û ji Xatûn Rezbar têgihiştin, hiş û jêhatîbûn pêk hat, li avahiya însan cih girt." Wek li vir jî diyar e, hemû beş wekhev in û Xatû Rezbar jî di vê kelamê de, li gor ê din beşek wekhev girtiye. Ji destpêka mirovahiyê û avabûna gerdûnê de nehatiye jêderkirin, belkî hay li rastiya wê ya di hebûnê de çêbûye û li gor wê nêzikatiyê hatiye raberkirin.

Pir girîng e, dema ku hemû jî diçin û dixwazin di hizûra Siltan Sehak de xwe bidin nasîn, ewilî navê diya xwe û dûvre yê bavê xwe tînin ziman, bi vî rengî jî balê dikişînin ser wekheviya di ola yarî a di navbera jin û zilam de, her wiha di her mijar û cihî de jî vê yekê pêk tînin.

Li vir ez dixwazim balê bikişînim ser xwenasîna Yar Tahir ku dibêje; Ey Şehsewar Perdîwer, dema ku min bihîst tu li Pendîwerêyî ku ew der qibleya me ye jî yek ser hatimê. Niha ez ê xwe ji bêdawîtiyê (ezel) bi we bidim nasîn; beriya xuliqandina însan û çêbûna hîle û fitneyan navê min (Zerî) bû (yanî ew di bedena jinê de bûye), dûvre însan xuliqî û ez ji van însanan çêbûm.

Di vir de jî em dibînin ku di ferqa xuliqkarî û afirîneriya jinê de ne. Ew avaker, ruh û rêçikên gerdûnê tê dîtin. Jin wek a ku pêk tîne, ava dike û her tim di nav guherîn û veguherînê de ye tê dîtin; her wekî tekamûla di gerdûnê de...

Xelîfe Şaşa ku yek ji heft xelîfeyan e, dîroka hebûna (Xatûn Rezbar) digihîne demeke pir kevin û wiha dibêje; namîma Şaşa, namîma Şaşa, meşmarî xwur namîma Şaşa, şam çe came serê sedef mepoşa, çenî pîr (Rezbar) û serê mekûşa...

Li vir pîr jin e, yanî Rezbar e û wê di berdawamiya vê de bide diyarkirin ku dema ku Şehsewar Perdiwer di nav cilê sir ê hundirê îstirê de bû û bi (Pîr Rezbar) re di cîhana razan de dixebitî.

Helbet li vir çend xalên girîng hene ku lazim e mirov îşaret pê bike. A ewil ev e ku Xatûn Zerbar sedema jidayikbûnê, xuliqandinê bû û her tim li cem xwedê ye, li di ola yarî de xwedî cihekî ebedî ye.

Her wiha di dema Berzenc de jî Pîr Bonyamîn, Xatûn Rezbar (Atsa) wekî bêdawîtî û sira bêhempa dide diyarkirin, hebûna jinan a di nav ola yarî de pir kevnar dihesibîne.

Bêguman rêûresma yarî xwedî dîrokeke kevin û dirêj e. Helbet ev ol xwedî paşeroj û nivîsên hatine tomarkirin lê ji ber êrîşên osmanî, ereb, moxol, safevî û hwd. gelek caran di navbera van êrîşan de mane, ji ber wê jî her tim neçar dimînin ku koç bikin.

Her wiha ji ber metirsî û neewlebûna herêmê gelek berhemên wan hatine texrîbkirin, dûvre gelek ji wan nehatiye xwendin lê berhemên heyî jî têra xwe agahiyan radigihînin.

***(didome)***

# Li sê navendan HDP'î binçav kirin

## Zext û êrîşên li dijî HDP'ê vê hefteyê jî bi Amed, Mûş û Gurgumê berdewam kirin. Polîsan li her sê navendan bi ser avahiyên HDP'ê û malên HDP'iyan de girtin û di serdegirtinan de gelek HDP'î binçav kirin

Zext û operasyonên qirkirina siyasî yên li hemberî HDP'ê hefteya borî jî berdewam kirin. Di nav hefteyê de bi daxwaza rakirina destnedana wan der barê 10 parlamenterên HDP'ê de fezleke hatina amadekirin û ji serokatiya meclisê re hatin şandin. Hemû fezlekeyên ku hatine amadekirin der barê axaftin û xebatên siyasî yên parlamenteran de ne.

Ji bilî van fezlekeyan Serdozgeriya Komarê ya Amedê der barê parlamentera HDP'ê ya Amedê Remziye Tosûn de lêpirsîn da destpêkirin. Roja çarşemê dema ku Remziye Tosûn çûbû avahiya partiya xwe, kesên ku li ber HDP'ê bi mehan e çalakî li dar dixin, bi sorkirina polîsan êrîşê wê kirin û heqaret lê kirin. Ev lêpirsîn ji ber ku Tosûn bertek nîşanî wan da, der barê wê de hat destpêkirin.

**Amed û Yenîşehîr**

Pişt re roja pêncşemê Serdozgeriya Komarê ya Amedê biryara lêgerîna navenda HDP'ê ya Amedê û HDP'a navçeya Yenîşehîrê derxist. Li ser vê biryarê polîsan bi ser her du navendan de jî girt û bi saetan li wan lêgerîn pêk anîn. Di lêgerînan de polîsan destiyê firçeyan, qovên çopê û pankart jî di nav de gelek amûrên li avahiyên HDP'ê desteser kirin û bi xwe re birin.

Her wiha piştî bidawîbûna lêgerînan polîsan Hevserokên HDP'a Amedê Zeyyat Ceylan û Hulya Alokmen Ûyanik û Hevserokên Navçeya Yenîşehîrê Kasim Kaya û Remziye Sizici binçav kirin. Piştî binçavkirinan, parlamenterên HDP'ê li ber avahiya HDP'ê ya Amedê daxuyanî dan çapemeniyê û bertek nîşanî operasyona li dijî partiya xwe dan.




**Mûş û Gurgum**

Dîsa di nav hefteyê de li Mûş û Gurgumê jî li dijî HDP'iyan operasyonên binçavkirinê hatin lidarxistin. Li navçeya Melezgirê ya Mûşê polîsan bi ser malan de girt û namzetê Hevşaredariya Melezgirê Erdal Çakar jî di nav de 5 kes binçav kirin. Li navçeyên Nûrheq, Avşîn û Celayê yên Gurgumê jî polîsan bi ser malan de girt û endam û rêveberên HDP û ÎHD'ê jî di nav de 21 kes binçav kirin. *AMED*

# Nûnerên Swêd û Albanyayê çûn serdana Rojava

Navenda Nûçeyan

Di nav hefteyê de piştî ku der barê hevdîtinên yekitiya kurdî yên di navbera PYNK –ENKS'ê de peyamên neyînî hatin dayîn, ji aliyê Tirkiyeyê ve li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê êrîşên dijwar pêk hatin. Bi van êrîşan re hevdîtinên dîplatîk jî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê çêbûn. Bi serokatiya Nûnerê Wezareta Karên Derve ya Swêdê Per Ornîûs ji Swedê heyetek serdana Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir.

Heyetê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 5 rojan hevdîtinan kir. Heyet hem bi PYNK'ê hem jî bi ENKS'ê re rûnişt û piştgiriya xwe ji bo hevdîtinan anî ziman. Heyetê bi Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mazlûm Ebdî re jî hevdîtinek kir û piştgiriya xwe ya ji bo parastina HSD'ê ya herêmê anî ziman û li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê ya li herêmê derket.

Ji bilî van hevdîtinên xwe yên partiyên siyasî û HSD'ê re heyetê bi nûnerên Rêveberiya Xweser û Meclisa Sûriyeya Demeokratîk (MSD) re hevdîtinan pêk anîn. Di van hevdîtinan de aliyan li ser pêşeroja herêmê û çeteyên DAIŞ'ê yên biyanî yên li girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê girtî ne axivîn. Heyetê qebûl kir ku çeteyên DAIŞ'ê yên swêdî li herêmê bên darizandin.

Serokê heyetê Per Ornîûs, der barê serdana wan de diyar kir ku piştgiriya Rêveberiya Xweser dikin û hêvî dikin ku ji bo tevahiya Sûriyeyê bibe nimûne. Ornîûs, destnîşan kir ku ew ne di nav lihevkirinên şerê li herêmê de ne û berovajiyê vê ew hewl didin rê li ber şerên heyî bigirin û çareseriya li cem aliyan bi pêş bixin.

**Heyeta Albanyayê**

Piştî heyeta Swêdê ji Komara Albanyayê jî heyetek serdana Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir. Di heyetê de Şêwirmendê Serokwezîrê Albanyayê yê Rojhilata Navîn Mark Xerîb, General Glides Nano û Efser Andrt Dode cih girtin. Heyetê serdana Hevserokê Desteya Pêwendiyên Derve ya Rêveberiya Xweser Ebdulkerîm Omer kir û li ser pirsên siyasî, ewlehî, xizmetguzarî û rewşa kampên koçberan gotûbêj kirin. Her wiha aliyan rêbazên hevkariyê ji bo têkoşîna li dijî terorê jî bi hev re gotûbêj kirin.

**Nirxandinên Misrê**

Ji bilî van serdanên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, daxuyaniyên balkêş ji Misrê hatin. Wezîrê Karên Derve yê Misrê Sameh Şukrî, bertek nîşanî destwerdanên Tirkiyeyê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê da û got ku xema wî ya herî kûr der barê destwerdana Tirkiyeyê ya Sûriyeyê de ye.

Berdevkê Wezareta Karên Derve yê Misirê Ehmed Hafiz jî bertek nîşanî destwerdanên Tirkiyeyê da û diyar kir ku hebûna Tirkiyeyê ya li Sûriyê ji bo tevahiya herêmê xetere ye. Hafiz got ku wê welatî wî li dijî hewlên guhertina demografiya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bixebite.





# 'Hê jî lêpirsîna îdarî venekirine'

Di 11'ê îlonê de li navçeya Şaxê ya Wanê leşkerên ku derketibûn operasyonê welatiyên bi navê Servet Tûrgût û Osman Şiban binçav kiribûn û piştre ew ji helîkopterê avêtibûn. Heta du rojan bi tu awayî agahî ji Tûrgût û Şiban nehatibû girtin û piştre li nexweşxaneyeke li bajêr derketibûn holê.

Tûrgût di cotmehê de jiyana xwe ji dest da û Şiban jî hê bi ser hişê xwe ve nehatiye lê heta niha avêtina ji helîkopterê ya Tûrgût û Şiban ji aliyê dewletê ve nayê qebûlkirin û daxwazên lêkolînê yên ji bo bûyerê ji aliyê HDP'ê ve hatin kirin jî ji aliyê desthilatê AKP-MHP'ê ve li meclisê hatin redkirin.

**Destpekê Tûrgût girtine**

Li ser navê Ji bo Demokrasiyê Yekitî (DÎB), heyeteke ku ji Perîhan Koca, Salih Zekî Tombak û Ayşegul Devecîoglu pêk dihat, di 9'ê cotmehê de çû Wanê û bi malbata Servet Tûrgût re hevdîtin kirin. Heyetê ji van hevdîtinên xwe raporek amade kir û ji partiyên siyasî û rêxistinên hiqûqî re şand.

Li gorî agahiyên ku malbata Tûrgût dane heyeta DÎB'ê; roja bûyerê leşker li navçeya Şaxê ya Wanê derketine operasyonê û li cihê bûyerê ewil 2 û piştre jî 8 helîkopterên Skorsky li herêmê firiyane. Leşkerên ku derketine operasyonê Servet Tûrgût girtine û bi xwe re birine mezra Sûrikê li vir Osman Şiban jî bi xwe re birine û ji gund derketine.

**Bi erdê ve kaş kirine**

Di berdewama raporê de cih ji axaftgina birayê Şiban Cengîz Şiban re hate veqetandin. Şiban dibêje ku leşkerên hatine gund ji wan re ev tişt gotine, 'Em bi hêrs in. Êşa me heye. Em kela xwe di serê we de hênik bikin'. Piştre Cengîz Şiban ev tişt dibêje: "Leşkeran gef li me xwarin û dema ku Tûrgût anîn gund şopên lêdanê lê tunebûn. Pirsa Osman Şiban kirin. Piştre Osman Şiban birin. Dema birin li çamika sutiyê wan dan û wan bi erdê ve kaş kirin û avêtin helîkopterê. Pêlav û şewqê wan li wir man."

Di dirêjiya raporê DÎB'ê cih da daxuyaniyên parêzeran û destnîşan kir ku li gorî daxuyaniya parêzeran heta niha pêvajoya hiqûqî û tu lêpirsînên îdarî nehatine destpêkirin. Di dawiyê rapora xwe de DÎB'ê xwest ev bûyer bê ronîkirin û der barê berpirsiyaran de lêpirsîn bê vekirin. *STENBOL*

# Di budçeya navendî ya 2021'an de careke din para zêde ya şer e

Navenda Nûçeyan

Polîtîkayên şer ku ji aliyê desthilatê ve tên meşandin krîza aborî ya li Tirkiyeyê kûrtir dikin. Dolar, euro û zêr her roj buhaha dibin û reqor li ser reqorê dişikînin. Li gel vê rewşa kambax jî ji aliyê rayedarên AKP'ê ve daneyên fermî yên aboriya Tirkiyeyê tên berovajîkirin.

Ji ber vê sedemê alîgirên AKP'ê jî di nav de, êdî kes ji daneyên fermî yên aboriya Tirkiyeyê bawer nake lê rastiya li qadê, daxuyanî û û daneyên fermî yên rayedarên AKP'ê didirewînin. Her roj bi rengekî cuda encamên giran ên krîzê xwe didin der.

**Kampanya!**

Ji ber gilî û gazinên gel ên xizaniyê MHP ku di her kêliyê de piştgiriyê dide AKP'ê, di nav hefteyê de kampanyaya nanê li asqiyê da destpêkirin. Li Tirkiyeyê çanda nanê li asqiyê çandeke kevn e û nîşana xizaniyê ye.

Li gorî vê çandê kesên halxweş dema ku li firinan nan dikirin nanekî zêde dikirin û li firinê dihêlin. Piştre kesên xizan ên nikarin nan bikirin, tên van nanan ji xwe re digirin. Ev kampanya MHP'ê weke îtirafkirina krîza aboriyê hat pênasekirin.

**Partiyan rexne kir**

Partiyên muxalefetê ev kampanyaya MHP'ê bi zimanekî tund rexne kirin. Partiyan destnîşan kir ku AKP-MHP êdî nikarin welat bi rê ve bibin û banga hilbijartina pêşwext kirin.

Di vê pêvajoya ku nîqaşên li ser krîza aboriyê zêde dibin de Budçeya Navendî ya Sala 2021'an a Tirkiyeyê jî pêşkêşî meclisê hat kirin. Hevdîtinên li ser budçeyê li komîsyona plan û budçeyê dest pê kirin.

**Para mezin dan şer**

Bi vê re hûrgiliyên pêşniyara budçeya AKP'ê jî derketin holê. Di budçeyê de para herî mezin dîsa ji şer û pevçûnên navxweyî û derveyî welat re hatiye veqetandin. Ev jî nîşan dide ku wê desthilata AKP'ê di sala 2021'an de şer û pevçûnan bidomîne.

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) li dijî vê pêşniyara budçeyê ya AKP'ê derket û budçeya gelan pêşniyar kir. Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Garo Paylan bi daxuyaniyeke çapameniyê pêşniyarên partiya xwe yên budçeyê bi raya giştî re parve kir.

## MAFÊ JIYANÊ NE TENÊ JI BO MIROVAN PÎROZ E

# Veganîzm bîrdoziyek e

Bêrîvan Kayi

*Di vê sedsalê de, êdî tê zanîn ku parastina mafên mirovan a bêyî jiyana ajal û nebatan kêm û bêwate ye. Paradîgmayên mîna parastina mafên mirovan, mafên jinan û parastina ekolojiyê tên nîqaşkirin! Veganîzm jî yek ji wan e ku dibe mijara nîqaşan. Bi kurt û kurmancî me vê hefteyê ji bo xwînerên Xwebûnê bi du ciwanên endamên koma bi navê Veganên Kurdistanê re hevpeyvîn kir ku veganîzmê bi zimanê kurdî didin nasîn.*

**Bi kurtasî em dixwazin we nas bikin.**

Silav li xwînerên Xwebûnê. Ez ji koma Veganên Kurdistanê Heyat Goren. Ev 12 sal in ku ez vejetaryen bûm. Îsal jî bûm vegan. Bawer dikim ku min di jiyana xwe de biryareke gelek baş da ku ez bûm vegan.

Dembaş, ez Serhat Tek. Ez xwendekarê zanîngehê me. Di sala 2017'an de min biryara vejetaryeniyê da û piştre min dest pê kir. Salek şûn de jî ez bûm vegan.

**Armanca we, bi van nîqaşên li ser veganîzmê yên bi kurdî çi ye gelo?**

Wek hemû welatan li Kurdistanê jî hejmara kesên vejetaryen û vegan zêde dibe. Mixabin tu xebatên kurmancî li ser veganiyê tune ne. A rast komeleyeke bi navê 'Kurdistan Vegans Organization' hebû. Ev komele 2018'an li Hewlêrê hatiye avakirin lê belê xebatên wan bi soranî û îngilîzî bûn. Loma me xwest em vê valahiya heyî bi keda xwe tijî bikin. Armanca me ya sereke nîqaşkirina veganîzmê ya bi kurdî ye. Ligel vê em dixwazin hêsaniya veganiyê ji kurdan re vebêjin û em bawer dikin veganî ji kurdan dûr nîn e. Ji ber ku gelê kurd bi hezaran salan ji bo hebûna xwe têkoşiyaye. Gelekî mafparêz, azadîparêz e û dizane bi bindestî çi ye. Veganîzm jî bi van têgihan re têkildar e. Lewra em nîqaşên veganîzmê li gor xwe zehmet nabînin. Ji ber vê yekê em xwe di nav têngasiyê de jî nabînin.

Ji bilî van em dixwazin zêdetir behsa veganiyê bikin. Ji ber ku gelek kes veganiyê tenê bi pêwendiya xwarin û vexwarinê dihesibînin. Ev hesibandin şaş e. Berî her tiştî veganîzm ne parêz ango diyet e. Bi temamî bîrdoziyek e û ev bîrdozî jî têkildarê hawirnasî, zayendî, exlaq, hişmendî, maf û jîngehê ye.

**Dema em li kar û xebatên we dinêrin, em dibînin ku hûn veganîzmê bi kurdî nîqaş dikin û didin nasîn. Hûn dikarin behsa girîngiya vê mijarê bikin?**

Em dixwazin di serî de wiha bibêjin. Em kurd in, zimanê me kurdî ye, wek her miletekî em jî dixwazin xebatên xwe bi zimanê xwe bikin. Ya din jî ji ber ku di nav kurdan de di derheqê veganîzmê de zanîn gelekî kêm e. Civaka me bi gelemperî felsefeya vejetaryenî û veganiyê baş nas nake. Nizane çi ye, ne çi ye? Kuştin û xwînmêtina candarên din ewqas hatiye normalîzekirin ku êdî mijara veganiyê bûye henek, dibêjin 'yaw veganî çi ye, kurd nikarin bibin vegan, bêgoşt em nikarin bijîn.' Hinek jî dibêjin 'ez bêgoştmayînê qebûl dikim lê ku mast û penêr nebe ez nikarim debar bikim' an dibêjin, pêdiviya bedena însan bi proteînê heye divê mirov ji bo tenduristiya xwe hêk, goşt an masiyan bixwin. Bi argumanên wisa xwe diparêzin û bertekê nîşan didin lê belê bi awayekî gelekî hêsan dikarin ji riwek, fêkî û nebatên mîna fistiq, behîv, findiq, brokolî, kartol, ispenax, hejîr, mûz û hwd. pêdiviyên xwe ya proteînê ji van bigirin. Her tişt ne goşt e. Gelek kes vê nizanin an jî naxwazin bizanibin.

Lewma me xwest em xebateke wisa li dar bixin. Wek hûn jî dizanin, di nav kurdan de goştxwarin gelekî berbelav e. Hema bêje di her cureyên xwarinê de goştê elok, mirîşk, berxik, karik û hwd tê bikaranîn û di taştê de mast, hêk û penêr xwarinên herî sereke ne. Yanî me jiyana xwe li ser kuştin û xwînmêtina candarên din ava kiriye. Em dixwazin vê rastiyê biguherînin. Mafê jiyanê ne bi tenê ji bo mirovan pîroz e, her wiha ji bo ajalan jî pîroz e. Însan û ajal bi hev re hene û parçeyek ji parçeyên xwezayê ne, di nav xwezayê de hevdu temam dikin. Mafê ti kesî nîn e kêrê bide ser hestûyê ajalekî û qetil bike. Em dixwazin ev refleksa civakî roj bi roj were guhertin. Eger mirov dev ji kuştina ajalan berde, wê dev ji kuştin û qetilkirina hevdu jî berdin. Ji bo jiyaneke xweş û azad berî her tiştî hewce ye em dev ji kuştina ajalan û talana xwezayê berdin. Xweza ji bo hemû candaran qadeke hevpar e.

Li aliyê din, her çi qas kurdên Bakur duzimanî (kurdî-tirkî) bin jî xebatên kurdî ji me re pêwîst in. Ji ber ku xebateke wisa dewlemendî ye, êdî nifşa nû ya Başûr û Rojava bi kurdî mezin dibe loma em ê zanyariyên xwe ji wan re vebêjin. Veganîzm parastina jiyanê ye.

**'Di nav kurdan de goştxwarin berbelav e' lê li aliyê din jî di çanda kurdan a xwarinê de nebatên wek tolik, kereng, gwrîz, xecxecok, pirpar û hwd. jî hene. Tenê gotineke bi vî rengî dê ne kêm be?**

Rast e xwarina goşt li hemû derên dinyayê heye ne tenê di nav kurdan de lê jixwe derdê me jî ev e. Gotina 'kurd û vegan çi gotiye hev?' bişkînin. Dema em li mitbexa kurdan mêze dikin mirov dibîne ku zêdetir xwarinên vejetaryen hene û piranî pincar in. Wek te jî gotî di nav kurdan de tolik, xerdel,pirpar xecîcok gelek tên xwarin û ji van cureyan tê hezkirin. Dema em hinekî berê xwe bidin mitbexa me kurdan, em ê bibînin ku ew gotina 'kurd û vegan û vejetaryen' dê pûç bibe. Jixwe em ê li ser rûpela xwe jî parvekirinên cureyên xwarinên kurdan parve bikin.

Ma kî ji me neçûye berhevkirina pincarê? Çi kur, çi keç, çi mezin çi biçûk em hemû çûne. Li herêma ez lê dimînim bi malbatî ve hemû kes diçin berhevkirina kerengan. Pincar parçeyekî çanda xwarinê ya kurdan e lê ji ber ku êdî wek tiştekî gelek normal tê xuyakirin tu kes behsa vê yekê nake.

**Vegan bi giştî kîjan proteînan distînin?**

Bi rastî ev pirs ji bo hinek veganan sosret tê. Ji ber ku proteîn ne tenê di nav berhemên ajalan de hene lê ev pirs gelek caran tê pirsîn loma pirseke girîng e jî. Di serî de divê em bizanibin proteîn çi ye. Ji bo tenduristiya mirov, pêwîst e beden hinek zewadeyan bistîne; wek rûn, av, karbonhîdrat, vîtamîn, mîneral û proteîn. Tê zanîn ku di bedena mirov de dema kêmasiya proteînê hebe gelek nexweşî rû didin. Proteîn ji kombûna amînoasîtan pêk tê û 22 amînoasît hene. Laşê mirov dikare hinek amînoasîtan sentez bike lê nikare 8'an sentez bike lewra divê mirov wan 8'an ji derve bistîne. Şaşiyek gelek mezin heye ew jî gelek kes zen dikin ku proteîn tenê di nav berhemên ajalan de heye lê proteîn di gelek nebatan de heye. Vegan jî proteînan wisa distînin. Bo nimûne, di 100 gram fasulî (24), nok (20), nîskî de (26) gram proteîn heye. Jixwe divê herî kêm 50 gram proteîn were standin.

**Hûn dikarin hinekî qala vîtamîna B12'an jî bikin? Girîngiya wê çi ye?**

Mijara vîtamîna B12 pir tê axaftin. Bi rastî jî vîtamînek girîng e. Çavkaniya vîtamîna B12'an ji bakteriyên axê ne. Gava ajaleke wek çêlek li çêrgehê diçêre, van bakteriyan jî distîne. Encama vê melisandinê, vîtamîna B12 pêk tê. Sosret e ajalên endûstrî nikarin wan bakteriyan bixwin çimkî ev ajal ne di nav xwezayê de ne. Loma jî di nav pûtên (xwarin-alif) ajalên endustriyê de jî vîtamîna B12 heye û ajalên endustriyê jî bi vî şeklî tên xwedîkirin. Loma ajalên endûstriyê ango yên di febrîqeyên şîr û goşt de tên kedîkirin nikarin vîtamîna B12'an pêk bînin. Yanî ajalên endûstriyê piranî vîtamîna B12 ji derve bi rêya amûr û alavan distînin. Vegan jî her wiha wisa bi alîkariya heba B12'an pêdiviya xwe ya vîtamînê distîne. Ji bilî vê vegan dikarin kêmasiya B12'an bê kuştina ajalan çareser bikin.

**Gelek kes dema nû veganîzmê dibihîzin pirsên mîna 'ma qey giya jî êş nakişînin?' dikin. Hûn di vê mijarê û di mijarên hîskirina ajalan de dixwazin çi bêjin?**

Belê giya jî zindî ye lê belê bi riwekan re hîs tune ye. Tu riwekekê jî kokê de rake an biquhirîne ti tiştekî hîs nake, ma ajal wisa ne? Ajal jî wekî însanan xwedî hîs in, hemû êşan hîs dikin; çaxa kevirek an darek li wan bikeve, êşê dikêşînin. Mirovek were serjêkirin çi êşê bikişîne çaxa ku heywan tên serjêkirin jî heman êşê dikişînin. Ti ferq di navbera serjêkirina mirov û ajalan de nîn e. Çimkî di her duyan de jî heman refleks hene. Rih bo mirovan çi qas şîrîn be ji bo ajalan jî ewqas şîrîn e. Divê mirov bikaribe ji vê hêlê de li mijarê binihêre û tiştekî din jî; mesele tenê ne xwarina goşt e, di heman demê de jî bo sektora endustriyê li ser gelek cureyên ajalan êrîş û îşkenceyeke sîstematîk tê meşandin. Ji sektora xwarinê bigire heta sektora kozmetîk û lixwekirinê, ajal ji bo kêfa mirovan bi awayekî hovane tên qetilkirin. Mînak, ji bo cil û bergên em li xwe dikin bi hezaran heywan bi şehweteke gelekî mezin a bazirganiyê tên kuştin. Ji çermê ajalên mîna hirç, kîvroşk, xezal, mar, pezkovî û hwd. pêlavan, montan, lepikan, çenteyan, qayîşan û gelek tiştên din çêdikin, difiroşin, pereyekî mezin jê derdixin.

**Çi li we bandor kir ku hûn bûn vegan?**

**Heyat Goren:** Ez ewil vejetaryen bûm bi qasî 12 salan, haya min ji veganbûnê hebû. Paşê min hevalek nas kir, got ez vegan im! Vê yekê bala min kişandibû. Piştre bi qasî sê çar mehan ketim nav lêkolînê. Êdî ez fêr bûm ku bê tiştên ajalan jî dikarim bijîm. Dilê min hew tahamûl kir li ser zindiyekê jiyana xwe bidomînim, dilê û mejiyê min li hev kirin êdî hemû sedem bêwate bûn. Hem ji bo xwe hem ji bo zindiyan ez bûm vegan!

**Serhat Tek:** Dema ez li lîseyê bûm min vejetaryenî nas kir lê bi min gelekî ecêb dihat. Çimkî tiştekî pir dûrî min bû û min zêde lêkolîn nekir. Piştî destpêkirina zanîngehê, li ber çavên min pişîkek ket bin tirimpêlekê û mir. Vê bûyerê bandoreke mezin li min kir. Ez xwe bi xwe fikirîm û min ji xwe re wiha got 'Dilê min ji bo pişîkê şewitî lê ji bo ajalên ku ez dixwim çima naşewite.' Ez wê rojê bûm vejetaryen lê belê vejetaryenî jî têra min nedikir. Ji ber ku sedema vejetaryenbûn û veganbûnê yek e. Eger sedem yek be, pêwîst e mirov a herî rast pêk bîne. Salek paşê ez bûm vegan.






Gelek kes veganiyê tenê bi pêwendiya xwarin û vexwarinê ve dihesibînin. Ev hesibandin şaş e. Berî her tiştî veganîzm ne parêz ango diyet e. Bi temamî bîrdoziyek e û ev bîrdozî jî têkildarê hawirnasî, zayendî, exlaq, hişmendî, maf û jîngehê ye

## Veganên Kurdistanê kî ne?

Koma Veganên Kurdistanê ji kesên vegan û vejetaryen pêk tê. Kom di sala 2020'an de bi armanca ku felsefeya veganîzmê li Kurdistanê bidin nasîn û nîqaşên xwe bi kurdî bikin ava bû. Veganên Kurdistanê ev demek e kar û xebatên xwe li ser medyaya civakî bi rê ve dibin.



Lokman Polat

# Her meh romanek

Xwendevanên ezîz,

Pêşî ez ji rojnameya Xwebûnê re spas dikim ku ez ê tê de mehê carekê der barê romaneke kurdî de dîtinên xwe binivîsim, romanê şîrove bikim, binirxînim û ji bo xwendevanên kurd bidime danasînê.

Xwendin xwenasîn e; divê mirov bixwîne. Pêşveçûna însanan bi xwendinê pêk tê. Min li ser girîngiya xwendinê gelek caran nivîs nivîsine û pêşkêşî xwendevanan kirine. Lêbelê, li ser girîngiya xwendinê mirov çiqas jî binivîse têr nake.

Civak bi xwendinê bi pêş dikevin. Bêyî xwendinê pêşveçûn çênabe. Civakên modern bi saya xwendinê gihaştine rewşeke ferah. Xwendin jiyana kesan û ya civakan digehurîne. Di nav civakê de prosesa xwendin û nivîsandinê pîvana pêşveçûna civakê nîşan dide.

Arîsto dibêje; "Di her însanî de meyla xwendinê, pêzanînê heye." Ev meyl li gorî rewşên civakî, li gorî şert û şirûtên heyî, tê guhertin. Li cihên ku îmkanên xwendinê tune ne, meyla guhdarîkirinê derdikeve pêş. Guhdarîkirin ji xwendinê hêsantir e. Kultura devkî ya gelêrî li ser şêweya vegotin û guhdarîkirinê pêk hatiye. Di demên berê de, edebiyata devkî gelek xurt bûye. Di edebiyata kurdî de jî edebiyata devkî ji ya nivîskî xurtir bûye û hê jî xurttir e.

Xwendin hem ji hêla ferdî-kesayetî- û hem ji hêla civakî ve serketineke bêhempa ye. Descartes dibêje; "Difikirim, nexwe ez heme." Xwendin û zanîn maneya hebûna mirov bi mirov dide fêrkirin. Heger mirov maneya hebûna xwe nizanibe, çi ferqa mirov û heywanan heye! Xwendin kategoriyeke hebûna însanî ye, hebûna mirov bixwe ye.

Hinek xwendin û nivîsînê wek çalakiyeke pasîf dibînin lê ne weha ye. Xwendin fêrbûna zanistê ye û nivîsîn jî berhemkarî ye. Berhemkarî, afirandina berheman bi serê xwe hunerek e. Ew kesên ku nivîs dinivîsin, berhem diafirînin heger her tim nexwînin nikarin berheman biafrînin. Nivîskarên herî baş di esasê xwe de xwendevanên herî baş in. Helbet xwendin tenê xwendina dibistanê û wergirtina dîplomayê nîn e. Jixwe pirtûkên ku mirov di dibistanan de dixwîne û pirtûkên din ne wek hev in.

Xwendin, fêmkirina ji tiştên ku tên xwendin, asoyên mirov fireh dike; mirov ji dinyaya teng xilas dike. Dema mirov pirtûkên edebî û felsefî dixwîne lênêrîna mirov a li jiyanê tê guhertin.

Xwendin û nivîsîn kedeke zinhî ye; qîmeta her cure kedê giranbiha ye. Xwendin û nivîsîn çalakiyeke jiyanê ye. Di temamê jiyana mirov de cihê xwe digire.

Xwendin beriya nivîsînê tê. Ji biçûkiya mirov ta dawiya jiyana mirov, tim û tim divê mirov bixwîne. Helbet nayê wê maneyê ku di civakê de her yê dixwîne dinivîse jî. Na. Yên dinivîsin, nivîskariyê ji xwe re dikin wek mesleg/sin`et gelek kêm in.

Xwendin wek nivîsînê nîn e. Yê bizanibe bixwîne û ji xwendinê hez bike, dê tim bixwîne. Wek ku Marcel Proust dibêje; "Zewqa xwendina pirtûkê, zewqeke orîjînal e." Divê mirov ji vê zewqa orîjînal tehm û lezetê werbigire.

Nivîskarên bextiyar kêm in lê xwendevanên bextiyar hene û gelek in. Ez bixwe yek ji wan xwendevanê bextiyar im. Ma bi dil û can xwendina berhemên edebî kê bextiyar nake? Berhemên klasîk, yên Cervantes, Dostoyevskî, Tolstoy, Shakespeare, Molîêre, Çexov, Hûgo, Zola, Turgenyev, Çernîşevskî û her weha berhemên klasîk ên kurdî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û xwendina berhemên modern ên nivîskarên cîhanê digel berhemên kurdî yên nûjen, mirov çawa bextiyar nekin? Min dema van berheman xwend û ez dema berhemên edebî dixwînim, çîrok, helbest û romanên kurdî dixwînim jê haz/xweşhaliyê digirim, şad dibim, bextiyar dibim.

Xwendevanên delal, hûn jî bixwînin, hun ê bi xwendina berhemên edebî, bi xwendina romanên kurdî bextiyar bibin.

Berê tenê weşanên çapbûyî hebûn. Paşê teknîk û zanyarî bi pêş ve çû, înternet derket û pê re weşanên elektronîk derketin holê. Weşanên elektronîk bi xwe re gelek hêsanî anîn lê li gor dîtina min di hêla xwendinê de bi qasî weşanên çapbûyî yên li ser kaxiz tehm û lezeta xwendinê nade mirov. Arşîvkirina weşanên çapbûyî, ji bo pêşerojê hêja ye.

Ji bo ku nivîsên nivîskarên kurd bigihîjin pêşerojê, bibin arşîv, têkevin pirtûkxaneyan, di demên pêş de ev nivîs werin dîtin û xwendevanên wê demê/ferz bikin 50 sal şûn de/ ji van nivîsan haydar bin, ji wan sûdê wergirin, divê nivîsên kurdî, weşanên kurdî yanî rojname, kovar û pirtûkên kurdî li ser kaxizan bên weşandin, yanî bên çapkirin.

Weşanên tên çapkirin gelek girîng in. Ev weşan di nav gel de tên belavkirin; di gelek pirtûkxaneyên zanîngehan de û her weha di gelek arşîvên sazî, dezgeh û kesan de tên arşîvkirin.

Di vê hejmarê de, min der barê girîngiya xwendinê û her weha girîngiya weşanên çapkirî, bi kurtahî çend tişt gotin, dîtinên xwe anîn zimên. Di hejmara bê de, ez ê bi sernavê 'Her mehek romanek' dest bi rêzenivîsên xwe bikim.

Hetanî meha bê, bimînin di xweşiyê de...







Stêrka Gelawêj
Yildiz Çakar

# Zêmarên Rojê – II

...û bi kulmeke agir çûm ber derî, sê caran min deng lê kir, sê caran min li derî xist.

"Ez im ew kes, şîrêta dadê, zêmarên rojê me."

Ew ê li pişt derî; deng nekir, agirê di sînga min de kêm nekir. Nekir xem û venekir derî birehm.

Agirê di sînga min de gur bû, dengê min ê li ber derî berz bû.

"Ez im ew a di nav perên te de sîs dikir a di nav heft tebeqeyan de û morîka spî ya stûyê qederan."

Qetiya benikê morîkê, belawela bûn her yek li rûyê malokê. Nivîsên qederan, bêdeng ramûsa gulên mezelan. Mezel bû warê bêkesan. Ên man, man ji nifşekê, ji windayên êşkêşê.

Ji çola Sînayê hilgirtin dengê asayê. Gurme gurma avê, ket ji devê bilûra lalê. Ew ê av û agir li hev evirand qeherî ji min û bi carekê re gote min:

"Bawerî yek e, derî hezar."

Ew ê şev bi stêrk, şibake ronî dikir, ka bêje min, kîjan text ji me re heq e? Ka binêre balîfên zarokan ji hêstiran gol, devê wan ji pêsîran qut e. Çima şîrê dayikê helal nake şûrê devbixwîn ê bi navê te radibû û li dara jînê diket.

Hêrs bû û got:

"Her kêliyek raz e, ji faniyan re him merez him miraz e."

Min got: "Ew ê çavê wî ji gerdûnê mezintir, ka bêje min ev raz çi miraz e; tê de her roj xwîn û mirin serfiraz e. Ka binêre! Deriyên perestgehan mohr, çirayên li ser destan xwelî û sar in. Parêzvanên wan her yek ji cihekî winda ye."

Kor e macir ji bextê xwe; ka wê li kê bikin gilî û gazinc, ji kul û birînên xwe. Diçin ku, li dewsa xwe dihêlin warek bêefare, evînek ji birînê tu car ne kewiyayî. Pir li jortir e bihuşt ji xewnan; dibêjin kulmeke agir e jiyan, hinekan geş dike hinekan dike arî, ji wan kevirên sîtavê. Li ku hatiye dîtin, hewar li ser kortikên miriyên xwe dike şîn bi zarezar? Kîn dike bayê xezebê, şûrê devbixwîn, weke siyekê digire ser, hemû rêyên Babîlê. Tên xewna min, cendekên li ser rêyan; rê li hemû hewariyan girtî ye bi heft kilîdan. Ew ê xwediyê derî û rêyan, ka bibêje min; te çima baweşan kir li tarîtiyên li pişt heft tebeqeyan?

Ew ê xwediyê siwarên şev û rojan gote min:

"Eger tarîtî veneke dilê xwe, tu yê çawa bibînî çavên rojê bi xweşikî?"

Wer kir, derî deng qet li xwe bi reng nekir. Go: "Nesekine navîna erd û ezman, pir pîroz e agirê di sînga te de, wek diyarî ji hemû zemanan."

Min go: "Dilê xwe giran neke ji dil û çavan; betal e xewa jinan li van axirzemanên ku di çirava xwînê de mane. Ji heft rojan rojek, ji rojê tacek dixwazim; ji zarokên berşîr re loriyeke bêşewat. Ka binêre bi çavek, çawa li me dibare jahr ji devê dojehekê. Yê destên wî ji gerdûnê mezintir, çawa xerabî bû ji başiyê bihêztir. Ka binêre, hûtên heftserî bûne xwediyên çolên bêserî û zincîr kirine qîz û bûk; canê ku te bi destê xwe da wan, dixwazin yeko yeko bidin ber agirê hedadan."

Ew ê can da axê, kom kirin ruhên xwe yên ji heft aleman û gote min: "Agirê hedadan malê diziyê ye; hûtên heftserî ne ji axa min ên vê sirê ne."

Ew ê av û agir evirand, ji bayê tov reşand, heft roj serê xwe bi dayê (Hawa) û bavo (Adem) êşand qeherî ji min û got:

"Ji bexçeyê bihuştê min ji we re rê kir çar şet, dudu ava nû ne dudu jî şerbet. Ji deştên eniya xwe min ji we re kir hezar û yek nebat; ji genim, zeytûn û hêjîr ji ava heyatê. We çawa şerbet kir jahr, war kir bêbihar, devê tifinga ji mirinê re bûye alav."

Min got: "Bêyî te pel nakeve ji darê, kûrmorî nakevin bin axê. Ka bêje kî dikare bidize agirê jiyanê; hûtê heftserî şerbeta şetan çawa dike gola xwînê?"

Gote min: "Destpêk û dawîn ez im. Nebêje min tu li wir î an li vir; ji çavê dil li her derê ew ez im. Biwezn e dinya; hêlek tarî hêlek ronahiya çavan. Azmûn e ji xwîn û şetê avan."

Tenê sê caran lê zivirîm, tenê sê caran min deng kir: "Ez im ew kes, xwediya razê, xewna axê me û bi kulmeke agir li ber derî me ez. Di sînga min de dişewitin gund û bajar, dikin qirçeqirç bîranînên windayan. Ka careke din bievrîne jiyanê; bila derkeve wek stêrka berbangê û ronî bike taliyan."

Ew ê kevir zindî kirin, hevsarê stûyê wan ji zincîrê, mûcizeyên faniyan bi nav kirin, ji bo wezna dinê du lib genim kirin nanek û li welatan pay kir. Dengê min ê winda li min zar kir. Şev û rojan giriyên dayikan bi serê min de li min helal û xweş kirin; birîn li dilê min geş kirin; tofan yeko yeko bi ta kirin, li ezman re kirin gerdenî û diyarî kir.

Min got:

"Ez im ew a li ber dara jînê, sisê sisê min di kulma xwe de vexwar ava mirinê. Nebêje min mirin çawa tê vexwarin?"

Vexwar êş bi qurtequrt ji zimanê dayikê; bênav man nifşên rojê ta ji ezman tê. Ezman girt deriyê xwe, li hemû stêrkên kadizê. Ew ê dilê wî nefesa min e, ka bibêje; wê zarok çawa vegerin malê? Wê kî paqij bike dinyaya ku destê wê di dilê wê de maye li ber derî?

Ew ê nefesa wî bihar, bi hêrs bû; destê xwe li bahozan xist, stûyê ewran şikand û çavê ezman rijand. Stêrka sibê wek alaya hebûnê di gerdeniya jînê de şidand û go ka temaşe bike: "Kesk û sor û zer e kulîlkên sînga min, pîroz e çiyayên kulma min. Aliyek dojeh e, aliyeke bihuşta xetên li eniya min. Ev tofana çendan e, roj di keştiya tarîtiyê de esîr e?"

Sê caran min kapaxên çavan girtin; sê dilop ketin ji çavên min; axê sisê sisê vexwar avê ji donzdeh avzêmkên çolê; qeder sisê sisê daqurtand raza kevir û jinek kêziyê xwe yê mor ê ji devê kêrekê, girt û bir bi dara hebûnê ve bi dar ve kir û got:

"Eger wezna te heq be, deynê jiyanê ji me re pir e."

Ji wê rojê heta vê rojê, guliyên jinê yên li wê sêdarê her dirêj bûn, emrên zarokan her kin... Wek tovên ku di axê de çandî, dayikên bejnbilind zarokên xwe diçandin, sêsed û şêst û şeş roj di vî bexçeyê mirinê de kulîlkên êgir av direşand. Ew ê çavên wî gerdûnî ka bibêje min tov wê kengî şîn bê, keştiya tarîtiyan wê kengî ji ya xwe bê û roj jî li dara jiyanê!

Dakeve ji wê abadîniyê! Heft rengên perên xwe bireşîne li deşta rûyê xwe; bila xwîna qîz û lawan were şûştin ji deriyên miradan, bila tola guliyên bûkan ên bi hezaran salan rabe ji goristanan; bila cihên bihuştê bin çiya û zinar, ji dengê zarokan re.

...û bi kulmeke agir mam li ber derî, sê caran min li derî xist û sê caran min deng kir:

"Ez im ew kes, kilama bêdengiya te me ez."

# Diyaloga kurdî-kurdî dê bidome

Diyaloga kurdî-kurdî ya di navbera ENKS û PYNK'ê de herî dawî bi boneya hin xalên ku li hev nekirine sekinî. Der barê mijarê de Endamê Desteya rêveber a PYD'ê Aldar Xelîl û nûnerê ENKS'ê Şelal Gedo axivîn

Navenda Nûçeyan

Gel, sazî û raya giştî ya kurd bi salan e ji bo yekitiya kurdan di nav liv û tevgerê de ne. Piştî êrîşên Tirkiyeyê yên li ser Rojava êdî daxwaza gel, sazî û raya giştî ya kurd a ji bo yekitiyê her çû bi dengekî bilindtir derkete holê. Li ser vê yekê gelek caran partiyên kurdan ji bo yekitiyê hatin cem hev lê heta niha negihîştine encameke berbiçav.


Herî dawî di gulana 2020'an de ENKS û PYD hatin gel hev û ji bo yekitiya daîmî di hin xalan de li hev kiribûn. PYD û ENKS di 16'ê hezîrana 2020'an de hatin cem hev û bi daxuyaniyekê li ser hin xalên hevpar lihevkirina xwe îlan kiribûn. Der barê diyaloga kurdî-kurdî de hefeteya borî Endamê Desteya Rêveber a PYD'ê Aldar Xelîl axivî û diyar kir ku diyalog xitimiye û helwesta ENKS'ê rexne kir. Li ser vê yekê me jî wekî rojnameya Xwebûnê der barê diyaloga kurdî-kurdî de nêrînên Nûnerê ENKS'ê Şelal Gedo guhdarî kirin. Gedo diyar kir ku diyalog hinekî westiyane lê dê berdewam bikin.

**Daxwaza nîvenîv**

Endamê Desteya Rêveber a PYD'ê Aldar Xelîl der barê diyaloga kurdî-kurdî axivî û destnîşan kir ku ENKS li dijî pergala perwerdeya bi zimanê kurdî û hevseroktiyê derdikeve û diyar kir ku piştî serdana dawî ya ENKS'ê ya Tirkiyeyê helwesta wê hatiye guhertin û daxwaza nîvenîvê dike.

Aldar Xelîl destnîşan kir ku ENKS'ê ji bo razîkirina dewleta tirk daxwaza rakirina pergala hevserokatiyê dike û got ku divê destkeftiyên şoreşa Rojava bên parastin. Xelîl anî ziman ku ev yek li dijî demokrasiyê ye û nayê qebûlkirin, lewra ev yek gerantorên lihevkirinê jî matmayî hiştine.

Her wiha endamê Desteya Rêveber a PYD'ê Aldar Xelîl guhertina helwest û biryarên ENKS'ê bi pêkanîna daxwaz û planên aliyên derve û dijmin ve girêda.



**Diyalog hinekî westiyaye!**

Sekreterê Partiya Çep a Kurdên Sûriyeyê û Nûnerê ENKS'ê yê di nav Îtîlafa Sûriyeyê de Şelal Gedo jî derheqê diyaloga kurdî-kurdî û yekrêziyê de ev tişt got: " Diyaloga kurdî-kurdî zêdeyî şeş mehan bi çavdêriya Amerîkayê û bi gerantoriya wê dest pê kir. Hem qonaxa yekemîn hem jî ya duyemîn serkeftî bûn. Nêrîna siyasî ya her du aliyan her wiha bû yek û Lêvegera Bilind a Kurdî jî biryarek da û lihevhatinek çêbû. Niha sefîrê Amerîkayê ne li vir e, ew çû Washîngtonê, dema sefîrê nû ji Washîngtonê were dê gerantoriya Amerîkayê dîsa bidome. Yanî hevdîtinên di navbera ENKS û PYNK'ê de wê bidomin. Diyalog niha hinekî westiyaye lê di wê baweriyê de me ku ne dûr e, serê meha bê dê gûftûgo bi tevlêbûna sefîrê Amerîkayê bidomin."

**'Em dixwazin bibin şirîkên hev'**

Şelal Gedo di axaftina xwe de bal kişand ser sedemên xitimandina diyalogê û wiha anî ziman: "Nabe ku mifredatên perwerdeyê li gorî bîrdoziyek an jî li gorî hizbekê were amadekirin. Ev mifredatên ku tên amadekirin hewce ye, nêzî mifredatên alemê bin. Divê em mifredateke wisa amade bikin ku her kes wê nas bike. Ji ber vê yekê dema ku xwendakarên me zanîngehê biqedînin û bibin xwedî dîplomayê divê ew dîploma bi kêrî wan were û ji bo karên wan li her deverê were nasîn. Ji ber ku em beşeke ji Sûriyeyê ne, nabe ev tiştên ku em çêdikin ji me tenê re bin, divê kesên din jî wan tiştên me bizanbin û bipejirînin.


Di meseleya hevserokatiyê de di navbera ENKS Û PYNK'ê de cudahî pir in. Ne mimkûn e ku em wek ENKS'ê tev li îdeolojiya PYNK'ê bibin an jî tev li mifredata wan a siyasî bibin. Em dixwazin bibin şirîkê hev ji bo ku em welatê xwe bi rê ve bibin, şirîkatiyeke heqîqî. Mesela hevserokatiyê bêtir meseleyeke ku bi PYD û PKK'ê re girêdayî ye. Ez ne bawer im ku hevdîtin bi sedemên wiha biçûk têk biçin an jî dawî li hevdîtinan were. Dê ENKS vê îdeolojiyê qebûl neke û ez bawer im wekî welatekî gerantor dê Amerîka jî van tiştan qebûl neke. PYD partiyeke Sûriyeyê ye ne girêdayî PKK'ê ye."

**'Em ji hilbijartinan re amade ne'**

Nûnerê ENKS'ê Şelal Gedo da zanîn ku di demê pêş de ji bo hilbijartinên Rojava ji bilî demokrasiyê di destê wan de tu tişt tune û wiha pê de çû: "Dema peymana dawî were îmzekirin piştî wê dibe ku hilbijartin çêbibe. Nabe ku Rojava tim di nav aloziyê de bimîne. Bêguman armanca me ya sereke li ser hilbijartinan e. Em ji hilbijartinan re tim amade ne. Li gorî me divê welatê me bi rêya demokrasiyê û bi hilbijartinan bê birêvebirin."

**'Bi hêviya mizgîniyan'**

Sekreterê Partiya Çep a Kurdên Suriyeyê û Nûnerê ENKS'ê yê di nav Îtîlafa Suriyeyê de Şelal Gedo di dawiya axaftina xwe de ji bo diyalogên kurdî-kurdî banga nermbûnê li PYNK'ê kir û wiha got: "Em hêvîdar in ku ev diyaloga kurdî-kurdî ji ber berjewendiyên hizbî û teng nesikinin û paşde neçin. Ez hêvîdar im ku hevalên PYNK û PYD'ê hinekî nerm û amade bin. Ji bo ku em di nêrînên xwe de hevgirtî ne, em bawer in ku ev diyalog dê bi ser bikevin. Di dawiya dawî de em ê mizginiyê bidin gelê xwe û li rojavayê Kurdistanê şahiyekê li dar bixin."



# Li dijî girtinên li başûrê Kurdistanê kampanya

Li Ewropayê li dijî girtina çalakvan, rojnameger û welatiyan kampanyayek berfireh hat destpêkirin. Endamên komîteya amadekar bang li her kesî kirin ku tev lî kampanyayê bibin.

Tê zanîn ku 17'ê cotmeha 2020'an bi pêşengiya Komîsyonên Başûr a Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdên li-Ewropayê (KCDK-E) ji bo azadiya Şêrwan Şêrwanî û girtiyên din ên di girtîgehên başûrê Kurdistanê de dest bi kampanyayekê kiribûn. Piştî re jî Kongreya Civaka Demokratîk ya Kurdên li Ewropayê, Federasyona Elewiyên Kurdistanê, Federasyona Civaka Êzidî, Civaka Îslamî ya Kurdistanê, Meclisa Şengal a Derveyî Welat di kampanyayê de cihê xwe girtin.

Endamên komîteya amadekar ên kampanyayê ragihandin ku di pêngava yekem de dest bi serdana hemû saziyên dewletan û yên sivîl, partî, konsolxane û komeleyên Ewropayê jî tev li vê kampanyayê kirine.

Endamê Komîteyê her wiha gotin ku wan der barê kesên ji aliyê PDK'ê ve bi taybetî yên li herêma Behdînanê hatine girtin, rapor amade kirine û radestî aliyên siyasî kirine. Di raporê de behsa doza rojnameger, nivîskar, rewşenbîr, mamosta û welatiyan hetiye kirin ku ji ber fikir û ramanên xwe yên cuda ji aliyê desthilata herêmê ve hatine girtin. Endamên komîteya amadekar ên kampanyayê dibêjin ku 'Em bang li hemû kurd û dostên wan dikin da ku li dijî vê zilm û zordariya hikûmeta herêmê ya li xelkê derkevin.' ***BRUKSEL***



# Ebdî: Rûsya ne ji dil e

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mazlûm Ebdî ji kovara amerîkî Foreîgen Polîcy re der barê nêzîkatiyên Rûsyayê yên li hemderî Rojava axivî.

Ebdî diyar kir ku Rûsya dixwaze wan û rejîma Sûriyeyê li hev bîne lê di rastiya xwe de tiştek wisa naxwaze.

Mazlûm Ebdî di axaftina xwe de da zanîn ku Rûsya dixwaze bi avakirina baregehan, hebûna xwe li rojavayê Kurdistanê û Sûriyeyê zexm bike lê dê nikaribe di vî warî de serkeftî be.

Ebdî ji ber aloziyên li rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Rûsya tawanbar kir û diyar kir ku Rûsya xwe wekî ku dixwaze rejîma Sûriyeyê û wan li hev bîne nîşan dide lê di rastiyê de tiştekî wiha naxwaze.

Her wiha Fermandarê Giştî Mazlûm Ebdî di dawiya axaftina xwe de bi bîr xist ku li herêmê hêza herî xurt hêza wan e û ew dixwazin bibin beşek ji artêşa Sûriyeya pêşerojê lê ne ya niha. ***WASHÎNGTON***



## 'Pêwîst e demografiya Sûriyeyê neyê guhertin'

Wezareta Karên Derve ya DYA'yê têkildarî Sûriyeyê li ser navê Koma Biçûk (Small Group) a Birîtanya, Fransa, Almanya, Erebistana Siûdî û Urdunê daxuyaniyek hevpar da. Di daxuyaniyê de diyar kir ku çareserî dê di çarçoveya biryara NY'yê ya bi hejmara 2254'an de were pêkanîn. Nûnerê Taybet Koma Biçûk a NY'ê yê li Suriyeyê Geîr Pedersenê ku xwest piştgiriya xebatan bike, teqez kir ku pêwîst e civîna 4'emîn a komîteya zagona bingehîn jî bê lidarxistin. Komê di çarçoveya biryara bi hejmara 2254'an de diyar kir ku dê hilbijartinek adilane û azad bi tevlîbûna hemû penabarên di welat û li derveyî Suriyeyê de bê lidarxistin. ***WASHÎNGTON***

# Ji bo kurdan helwesteke yekgirtî pêwîst e

Navenda Nûçeyan

## Sîyasetmedarê kurd Dr. Fayîq Gulpî der barê rewşa siyaset, aborî û leşkerî ya başûrê Kurdistanê de axivî û diyar kir ku li başûrê Kurdistanê siyaset ne di destê kurdan de, di destê dijminên kurdan de ye

Polîtîkayên hikûmeta başûrê Kurdistanê her diçe bi polîtîkayên Tirkiye û dewleta navendî ya hikûmeta Iraqê re dibin yek. PDK'ê heta niha li hember dagirkirina dewleta tirk a li başûrê Kurdistanê acizî û nerazîbûn nîşan nedane. Her wiha hemû polîtîkayên xwe yên qirkirinê yên li dijî destkeftiyên kurdan dispêre polîtîkayên PDK'ê.

Siyasetmedarê kurd Dr. Fayiq Gulpî der barê siyaseta başûrê Kurdistanê û êrîşên dewleta tirk ên li dijî Başûr, her wiha bandora wê ya li ser siyaset û aboriya Başûr axivî. Gulpî diyar kir ku li başûrê Kurdistanê siyaset ne di destê kurdan de ye, di destê dijminên kurdan de ye û sedema vê yekê jî wek nebûna helwesta yekgirtî ya gelê kurd nîşan dide û wiha dibêje: "Divê li dijî dagirkeriyê û ji bo azadiya Rêber Ocalan pêngaveke giştî were avêtin."

**Armancên netewperestiyê**

Dr. Fayiq Gulpî di axaftina xwe de balê dikişîne ser polîtîkayên mezhebî û netewperestî yên dewleta tirk û wiha tîne ziman: "Tirkiye xwedî stratejiyek netewperest e. Dixwaze bi rêya mezhebî, armanca netewperestiya xwe bi cih bîne. Yek ji armanca din a Tirkiyeyê, tunekirina gelê kurd û destdanîna ser destkeftiyên her çar parçeyên Kurdistanê ye. Ji bo vê jî har bûye û bi hemû hêza xwe êrîş dike."

Gulpî dide zanîn ku dewleta tirk dixwaze ji aliyê leşkerî, îstixbarî, aborî û siyasî de, dest deyne ser başûrê Kurdistanê û wiha diyar dike: "Salên borî gelek pêşengên tevgera azadîxwaz a gelê kurd hatin şehîd kirin. Em dibînin ku aboriya me qels bûye. Niha lihevkirina Bexda û Hewlêrê ya li ser Şengalê di rojevê de ye û ev yek jî ji bo berjewendiyên Tirkiyeyê ye."


**Deskeftiyan tune dikin**

Siyasetmedarê kurd Gulpî, lihevkirina Bexda û Hewlerê wekî beşek ji komploya dewleta tirk a li dijî gelê kurd bi nav dike û wiha dibêje: "Dixwazin hêza ku êzidiyan parastiye û bi awayekî rêk û pek îdare kiriye ji holê rakin. Ev jî li dijî îradeya xelkê Şengalê ye û ji bo feydeya dewleta tirk, Iraq û Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ye."

Di berdewama axaftina xwe de Gulpî diyar kir ku kurd li başûrê Kurdistanê hatine bêbandorkirin, siyaseta başûrê Kurdistanê di destê dijmin de ye û wiha pê de diçe: "Tirkiye li Hewlêr, Silêmanî û gelek cihên din saziyên îstixbaratê ava kirine. Hizbên siyasî jî li gorî xwestek û îradeya îstixbarata welatên herêmê kar dikin. Ji bo vê yekitî di bernameya wan de nîn e. Li başûrê Kurdistanê siyaset ne di destê kurdan de ye. Siyaset di destê dijminên kurdan de ye. Ji ber vê ne tenê nikarin li dijî dagirkeriyê rawestin, her wiha li ser pirsgirêkên din ên weke peywendiyên li gel Iraq û Îranê jî partiyên siyasî yên herêma Kurdistanê nikarin di nav xwe de li hev bikin. Ew ne serbixwe ne û li dijî kurdan siyasetê dikin."

**Tecrîd û şerê taybet**

Her wiha Dr. Gulpî balê dikişîne ser şerê taybet ê dewleta tirk û polîtîkaya wê ya li hember Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û wiha dibêje: "Li başûrê Kurdistanê xelk hatiye xapandin. Hinek hizb û dezgehên îstixbaratê bi gel dane fêmkirin ku PKK û Rêber Ocalan terorîst in û dixwazin başûrê Kurdistanê tevlihev bikin. Îstixbarat vê yekê di nav xelkê de belav dike. Ji ber ku civak jî hatiye perçekirin, berjewendiyên neteweyî û demokrasî tên paşguhkirin. Ev yek jî bûye sedem ku hem di mijara azadiya Rêber Ocalan de hem jî li dijî dagirkeriyê, xelk ne xemxur be."



Dr. Gulpî wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ya herî baş li hemû cihanê dîvê li hemberî dagirkeriya dewleta tirk pêngaveke giştî were avêtin û ji bo azadiya birêz Ocalan jî divê beşek ji siyaseta giştî pêşengiyê ji pêngavê re bike. Divê xebatek baş a dîplomasiyê bi welatên li dijî Tirkiyeyê re bê kirin."

# Jinên êzidî li dijî 'peymanê' hevdîtinan dikin

Hikûmeta Navendî ya Iraqê û Rêveberiya Herêma Kurdistanê di 9'ê cotmehê de, têkildarî Şengala ku DAIŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de êrîş kiribû û komkujî pêk anîbû, bi peymanekê li hev kirin. Du şandeyên ji jinên êzidî pêk tên, ji bo vê yekê çûn Silêmanî û Bexdayê û hevdîtin kirin.

Şandeya li Silemaniyê bi sazî û partiyên siyasî re, şandeya din a li Bexdayê jî bi sazî û partiyên siyasî û bi hêzên Heşdî Şabî re hevdîtin kirin. Şandeya li Bexdayê ji aliyê fermandarê giştî yê Heşdî Şabî Ebu Fedek ve hat pêşwazîkirin.

Şandeya jinan a Şengalê di berdewama hevdîtinên xwe de, li Silêmaniyê serdana Rêxistina Jinên Azad ên Kurdistanê (RJAK) kir. Di civînê de her du aliyan li ser lihevkirina Hewlêr-Bexdayê ya li ser Şengalê nîqaş kirin.

Şandeya ku du rojan li Silêmaniyê rêzehevdîtin kirin, piştre jî bi rêxistina RJAK'ê re der barê rewşa Şengalê û lihevkirina Hewlêr-Bexdayê de civînek li dar xistin. Di civînê de lihevkirina Hewlêr û Bexdayê wek berdewama fermanên li ser êzidiyan hat binavkirin û hat diyarkirin ku wan bi daxwaza dewleta tirk li hev kirine.



Her wiha şandeyê ji rêxistinên sivîl ên başûrê Kurdistanê, bi taybetî rêxistinên jinan, xwest ku li dijî lihevkirina li ser Şengalê helwesta xwe nîşan bidin û gelê êzidî bi tenê nehêlin.

Nûnerên RJAK'ê jî lihevkirina di navbera Herêma Kurdistanê û Bexdayê de ya li ser Şengalê şermezar kirin û lihevkirin wek binpêkirina îradeya êzidiyan bi nav kirin.

RJAK'ê piştgiriya xwe ji bo gelê Şengalê anî ziman û destnîşan kir ku dê bi her awayî piştgiriyê bidin gelê Şengalê. ***HEWLÊR***

# Boykotkirina kel û pelên Tirkiyeyê



Li Erebistana Siûdî, boykotkirina kel û pelên Tirkiyeyê didome. Ev boykot, her diçe li welêt berfireh dibe. Rojnamegerê Siûdî Umer Seyf Qeyd Mensur diyar kir ku boykotkirina kel û pelên Tirkiyeyê ji ber destwerdana dewleta tirk a li welatên herêmê dest pê kir.

Rojnameger Mensur, li ser armanca boykotê ji Rojnewsê re axivî. Mensur anî ziman ku boykotkirina kel û pelên Tirkiyeyê biryareke civakî ye û redkirina daxuyaniyên Erdogan ên di serdana Qeterê de ye.

Di berdewama axaftina xwe de Mensur wiha got: "Biryara civakê ya boykotê, encama destwerdana dewleta tirk a li gelek welatên herêmê ye. Bi taybetî encama wêrankirina welatên erebî ye ku bi rêya komên radîkal ên dixwazin heman tundiyê li welatên din ên erebî dubare bikin."

Mensur bal kişand ser girîngiya boykotê û wiha anî ziman: "Ev boykot ji aliyê xelkê Siûdî ve, li dijî Tirkiyeyê hatiye destpêkirin; ev çekeke aborî û siyasî ye. Dê ev boykot aramiya cîhana ereb biparêze. Tirkiye bi salan e bi milyar dolaran kel û pelan dide Erebistana Siûdî. Bi vê boykotê re, wê bandoreke neyînî li aboriya Tirkiyeyê bibe."

Boykotkirin li gelek welatên ereban belav dibe û her wiha gelên Ermenistan û Yewnanistanê jî tev li vê boykotê bûn. ***RIYAD***

# Di hefteyekê de herî kêm 286 kes ji ber koronayê jiyana xwe ji dest dan

Nexweşiya vîrûsa koronayê di dawiya sala 2019'an de li Çînê derket û belavî hemû cîhanê bû. Piştî belavbûna vîrûsê hemû welatan tedbîrên dijwar girtin û têkiliyên xwe yên bi hev re kêm kirin. Ev kêmkirin, ji aboriyê bigire heta jiyana rojane bandoreke neyînî li civakê kir. Hemû welat ketin pêşbirka dîtina dermanê koronayê ku bû sedema mirina sedhezaran mirovan lê heya niha dermanê koronayê nehatiye dîtin.



Vîrûsa koronayê bandoreke mezin li bakurê Kurdistanê û Tirkiye jî kir. Heya niha li bajarên bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê ji ber vîrûsa koronayê bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dane.

Tenê di hefteya borî de li bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê zêdetirî 286 kesan ji ber vîrûsa koronayê jiyana xwe ji dest dan. Ev hejmar li gorî daxuyaniyên wezareta tenduristiyê hatiye diyarkirin. Rêxistinên tenduristiyê destnîşan dikin ku hejamra kesên jiyana xwe ji dest didin, ji yên wezaretê zêdetir in.

Bi sermayê re, hejmara pêketiyan û yên jiyana xwe ji dest didin her diçe zêde dibe. ***AMED***

# Ebadî: Lihevkirina Hewlêr û Bexdayê pirsgirêkan çareser nake

Nerazîbûnên li hemberî lihevkirina Hewlêr û Bexdayê ya li ser Şengalê her diçe zêde dibin. Herî dawî serokwezîrê berê yê Iraqê û serokê Hevpeymana Nesir ê niha Heyder Ebadî jî li dijî lihevkirina li ser Şengalê nerazîbûna xwe anî ziman.




Serokwezîrê berê yê Iraqê Heyder Ebadî di daxuyaniyeke çapemeniyê de lihevkirina Hewlêr û Bexdayê ya li ser Şengalê rexne kir û diyar kir ku lihevkirina Bexda û Hewlêrê dê pirsgirêkên li herêmê çareser neke.

Ebadî di axaftina xwe de destnîşan kir ku ew dê weke Hevpeymana Nesir ne bi siyaseta Hikûmeta Iraqê ya bi Herêma Kurdistanê re bin.

Ebadî got ku ew ne li hemberî kurdan in lê ew li gel çareseriyeke di çarçoveya destûra bingehîn de ne û ev jî ji bo misogerkirina jiyana hevbeş û aştiya ji bo her kesî ye.

Her wiha Ebadî di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê de da zanîn ku ew ne li dijî kurdan in, berevajiyê vê ew bi xebatên xwe bi doza dîrokî û rast a gelê kurd re ne. ***BEXDA***



Ji Delav
Feratê Dengizî

# Siyabend an jî qeder 2

**III**

Beriya ku fikr û ramanên xwe parve bikim; dixwazim li wir guhertoyên hevpar binivîsim.

Hevparî: êtîmî, şikestina lingê negona pîrê, tehdeya ap û amojinê, rev, xewn…

Çek: Çîpê devê - Lahorê Qetlê (Ronî War), Xocê Xizir, hesp, şûr… Di hin guhertoyan de; hesinek di qurmekî de heye kes nikare derxe, Siyabend derdixe dike şûr…

Navê hespê û Qedê hinekî guherbar be jî dişibin hev. Tenê Selîm Temo di nivîsekê de navê hespê Siyabend wek Daybelqiran bi nav dike, min jî ji çend dengbêjan wisa bihîstiye.

Dara di navbera Xecê û Siyabend a dema mirinê de, Dara Benîştokê ye. Her bihar du gulên sor li wir şîn tên; di navbera wan de jî gulşîlav-şîlaneke direj dibin, bi serê Sîpan dikevin, kovîkêvî-pezkovî tên wan diçirpînin.

**Di dawiya destanê de tacir heye; bi şertê ku dest bavêje Xecê, dixwaze werîs bidiyê. Belê Xecê ji ber destavêtina têcir direve û xwe diavêje ser Siyabendê xwe. Ev bûyer, bêtir di guhertoyên devkî de derdikeve pêş.**

***

Dema mirov bi gelemperî destanê dixwîne yan lê guhdarî dike, hestên pir giran mirov radipêçin, mûyên canê mirov dibin şûjin. Qeder, felek û qedera neteweyekê, wek şerîda rêzefîlmekê di ber çavên mirov re derbas dibe û dibe wekî şîşeke sor a weke tu di nav dilê mirov re derbas bikî.

Sêwîtiya ber destê ap û amojinê çîna civakê (ango civaka çîndar) li ber çavan radixe ku bindestî tiştekî çi qas zor û zehmet e. Serdest vê yekê her tim wekî "karê beradayiyan" dibînin an jî wekî "îşê çîprûtan" şîrove dikin. Belê bi rastî ev ji bo bindestan "mît", "mîtolojî", "destan", "xeyala wekheviyê" û "lehengiya gel" bixwe ye. Şibandina gakoviyê gurî, nêrîna li hejar û bindestan, yanî nêrîna li bindestan e. Belê li aliyekî jî nêrîna li qedera jin-jînê ye. Wesifandina qedera gelê kurd e jî…

•Dîsa zordariya ap û amojinê mirov dibe beriya mîladê; dema têkçûna xanedana Medan û serdestî-zordestiya Persan; Astiyag, Harpagos, Kûrîş, Magi, Gomate, serhildan… Ew qeder hê didome, ew zincîra bindestiyê bi temamî neşikiyaye. Ap û amojin, kodên mirovantiya Persan û mêtingeriya wan in; serdest û bindest çiqas guherîbin jî serdestî û bindestî her berdewam e. Siyabend qodê serhildanê ye û heta niha, encam her tim Sîpan e û Xecê xaka qedîm e, welat e, Kurdistan e, dê ye, jin e ku îro jî jiyana wê malkambaxa darê şikestî ye. Ligel guherînên nû yên pîroz, jixwe hêvî xurt e. Rewşa edoqewm, antax, malpirên şirîkên serdestan jî destan zelal dike.

•Hestên Siyabend ên dema ku Qedê girêdidin jî bixweneewletî, tirs, dexesî û çavnebariya kurdan e. Hê jî em neyarê hev in, ji hev hez nakin lê heyranê xerîb û serdestan in! Ev qodên astengiya yekitiyê ne, mîna rewşa îroyîn…

•Gera li felekê, xwesteka tolhildana jê û nerazîbûna ji qederê ne tiştekî ketûber e. Rihê gera li azadiyê, riya evînê, fêmkirina hebûnê, şika ji rewşê, reva ji derew û kemînan e; xwesteka xelasiya ji bindestiyê, xwesteka dawîlêanîna mêtingeriyê ye. Raman, felsefe, watedayîna jiyanê, gera li heqîqetê ya kurdan û reh û riya dîrokî sembolîze dike ku ev hê jî bi çendîn veguherîn û çendbareyan didome. Belê Siyabend belkî jî qeder bixwe ye; ango qedera kurdan e!

•Em hêvîdar û bawer in ku vê carê encam ne hevrezana Sîpanê Xelatê lê pîroziya newrozan a dawet û dîlana Siyabend û Xecan, ên milyaketên çiyê, lehengên gel ên hemdem be. Hêvî newroza kurdan a newroza gelan û wekheviya jiyanê newroza gelên Rojhilata Navîn e.

•Guherîna guhertoyan û vegotina li her derê welêt, nasnameyeke neteweyî dide destanê. Wek ruhê hevpar ê gel e, ango ruhê hevpar ê gelê kurd e.

•Mêrxasiya Siyabend, mêrxasî û lehengiya gelê kurd e ku îro jî cîhan vê dipesinîne.

•Silîva jî qodek taybet e. Şêxê me yê mezin Ehmedê Xanî dibêje, "Sê devokên kurmancî weke durre hene; silîvî, mihemedî û botî…" Devoka silîvî û erdnîgariya wê ji Serhedê heta Behdînan, Zaxo û Mûsilê ye. Helbet navend Silîva (ku paşê Farqîn derketiye pêş lê herêma navborî îro jî Silîva, Silîvî, Silîvana bi kar tînin.) Ev temsîlek giranbuha ye.

•Bila ji destanê çend riste/beyt ji bo xwîneran bibin diyarî, (Siyabend û Xecê-Ahmet Aras) ku tehma wêjeya kurdî ya devkî bide bin zimên û dilşewatî bibe dermanê birînên niha yên sotî. Erê ev sewta dengjiyanî ne kêmî Homerosê navdar e;

Siyabend got:

*"Lêêê… Xecê li serê Sîpanê şev li me ketiye şevereşa,*
*Li Textê Hesengolê gul sor bûne, ketine reng û nexşa,*
*Feleka min xayin bû, gakûvî bi fermana Xwedê serê xwe daweşa,*
*Ez ê ser dara benîştokê da ketim diriyê diriyê darê birîna min diêşa,*
*Di ser şal û şapikên min da xwîna narincî berjêr direşa.*
*Wez iiim, wez im, weziiim,*
*Siyabendê Silîvî wez iiim."*

Xecê got:

*"De lo lo Siyabendo, Sîpan bişewite li şevreşa,*
*Derengî da li min tesel bû dengê dîkê şevê, wexta eşa,*
*Ez ê êvar da geryam, giryam, li newalan û van kaşa,*
*Li min tesel bû dengê Siyabendê Silîvî û nalîna nexweşa.*
*Wez iiim wez im, wez iiim…*
*Xeca xêrnedî wez iiim" (Rp.54)*
*(Dibe ku niha li Heftanînê ev rewş zindî dibe…!)*

Xecê got:

*"Lo lo Siyabendo, serê Sîpanê bişewite ba avêj e,*
*Ez ê bi qurbano birîndaro, him dinale him dibêje,*
*De tu van pirs û gotinan hilnede ji min ra nebêje!*
*Bila bi te ve eyan be, Xecê ji boy xwe navê camêra nabêje,*
*Xeca Mamo yê di zinar da xwe li pey siyarê xwe bavêje.*
*Wez iiim…wez im, wez iiim…*
*Xeca xêrnedî wez iiim…"*

Siyabend got:

*"Lêêê…lê Xecê dilê min ji kulê kuleke herî mezin lê..*
*Min ê destbirakê we yî hêja destgirêdayî da kuştinê,*
*Dara benîştokê li ber dilê min ketiye xûna reş jê tê,*
*Ez pey Feleka Xayîn ketim, min go belkî rastî min bê,*
*Min ê bajota, enya Heşînbozê Surê bida enya hespê wê,*
*Min ê deftera sûc û gunehên wê derxista ji paşilê,*
*Min ê bigirta bi pêsîrê, lê bikira dewa pîra dê û kale bavê,*
*Min ê lê bikira dewa canik û camêrê ku wê kirye bin erdê,*
*Ez çi bikim ku merama dilê min nehate cî li darê dinê,*
*A niha jî Feleka Xayîn li pêşberî min ketiye kêfê û dîlanê,*
*Kaba xwe hilo davêje, gûzên xwe bi min ra dide jimarê…*
*Wez iiim, wez im, weziiim,*
*Siyabendê Silîvî wez iiim."*

Xecê got:

*"De lo lo Siyabend, Sîpanê Xelatê bişewite ha bi gelî ye,*
*Tê dengê gur û hirçan û rêwilan, Xecê dara şikestî ye,*
*Ez ê bala xwe didimê, Heşînbazê Surê bi hîrîn û şiheşî ye,*
*Mîna meriva hêsran dibarîne, nizanim daxwaza vî ji min çi ye,*
*Xeca Mamo tevî Heşînbazê Surê li serê Sîpanê bixwe ye.*
*Wez iiim…wez im, wez iiim…*
*Xeca xêrnedî wez iiim…"*

Xecê nihêrî ku deng ji Siyabend nayê, dîsa got:

*"De lo lo Siyabendo, ez ê li Sîpanê Xelatê dinihêrim ha li kevira,*
*Rebê Alemê riyek li min vekira, pêpelûgek ji min ra,*
*Min ê xwe pê bigirta, peya bûma heta ba te bihatama wira,*
*Min ê çeleng-siyarê xwe bigirta ji dara benîştokê vekira,*
*Ez ê te ra bibyama belgî û berpal, min ê serê te rakira,*
*Min ê derman çêkira, birîna te bi destê xwe derman bikira,*
*Wez iiim…wez im, wez iiim…*
*Xeca xêrnedî wez iiim…"*

Siyabend got:

*"De lê lê Xecê etegên Sîpanê bişewitin ha bi gelî ne,*
*Li Textê Mêrga Gulîstanê hêşîn dikin kulîlk û karzî ne,*
*Bayê Elemberqalê cinazê min li ser darê dihejîne,*
*Feleka malxirab li Sîpanê destê bûk û zavê ji hev diqetîne,*
*Texdîra Xwedê her wisa ye, Siyabend bi çavên xwe bibîne.*
*Wez iiim, wez im, weziiim,*
*Siyabendê Silîvî wez iiim."*

Xecê got:

*"De lo lo Siyabendo Sîpanê Xelatê bişewite serjêr e,*
*Kevirên kambaxa Sîpanê îro ji min ra bûne gûzan û kêr e,*
*Bê te êdî dinya li min heram e, mirin ji min ra baştir û xêr e,*
*De tu ciyê min li ba xwe bike, ez ê xwe bavêjim werme jêr e.*
*Wez iiim…wez im, wez iiim…*
*Xeca xêrnedî wez iiim…"*

•Bêhtirê dengbêjan navê Siyabend bi kar tînin. Tê wateya zirav û dirêjiyê, (ango "sî" û "bend": siya bendê) benik ango nex, an siya bendan (dîwar), ên rez, erd an jî hewşan… Ji guhertoyên ku min rave kirine kesî navê Siyamend bi kar neaniye. Tenê herêma Sûrgiciyan û guhertoyek li Silîvan (ji devê Melîhe Tapancî-Folklora Me; hj.6-rp,81-83) Sîahmed bi kar anîne. Dibe ku li gorî devokê, herêmê xera kiribin.

•Biloka gundekî Dêrika Çiyayê Mazî ya bi ser Mêrdînê ve ye."

•Pîrê miya te heywan e û ez jî însan im. Bê haya min kevir gindirî û çû li lingê miya te ket. Belê tu dixwazî tu jî lingekî min bişikîne; belê ji apê min û jinapa min re nebêje. Bila ew nebihîsin. An na ew ê min bikujin."

**•Bela hat ser min, ez ne sûcdar im…** *(Dawî)*



# Hêrs û berxwedêrî

Kadîr Stêra

Gava li ser hêrsa dilê mirovan difikirim, ez careke din fêm dikim ku kapîtalîzm hêrs ji xwe re kiriye wek çekê.

Ji ber çi ez vê dibêjim? Ji ber ku kapîtalîzm reqabet e û reqabet jî berê mirovan dide jiyaneke şexsî. Em dikarin bi rehetî bêjin ku ev hesta hêrsê lîstokeke kapîtalîzmê ye.

Kapîtalîzm, dixwaze em bibin hêsîrê hêrsên xwe û di nav jiyaneke şexsî de dûrî civakbûnê bijîn. Ji ber vê mirovên bihêrs li pey hêrsên xwe diçin û ruhiyeteke metayî wan dorpêç dike.

Ew di vê dorpêçê de difetisin. Her bihêrs dibin kapîtalîzm dibe dûpişk û bi wan vedide; bi jahra xwe wan qirêj dike û berê wan dide hêrseke din. Ev jahr dike ku mirov xwe nas neke. Ev hesta ku kapîtalîzmê bi mirov şîrîn kiriye, rêya xwenasînê li ber mirov digire. Berê me dide tarîtiyê û hesteke pûç bi xwe re tîne.

Piştî mirov li xwe hay dibe û dixwaze xwe bibîne, dibîne ku bê hêrsê çi bi serê mirov de aniye ku êdî ev hêrs dibe nexweşiya kompleksê. Mirov ji hesta hezkirinê dûr dikeve û ew û hêrsên xwe bi tenê dimînin.

Ji bo mirov nebe hêsîrê hêrsê û li hestên mirovatiyê vegere, di serî de divê xwe ji hêrsên xwe rizgar bike. Panzehîra vê jî berxwedêrî ye. Divê em li ser berxwedêriyê bisekinin. Berxwedêrî rêya xwenasînê vedike; xwenasîn rizgarî ye, ronahî ye…

Hêrs Ehrîman e; berxwedêrî Ahûra Mazda ye. Divê mirov Ahûra Mazda nas bike, bo xwe bibîne. Rizgariya ji hêrsa Ehrîman, çûyîna li pey berxwedêriyê ango Ahûra Mazda ye.

Wateyeke berxwedêriyê ya pir kûr heye. Berxwedêrî mişt hest e, hezkirin e û berê wê her tim li heqîqetê ye. Hêrs temsîla ruhê madî, berxwedêrî ya manevî ye. Mirovên bihêrs her tim hepsiyên hêrsên xwe ne. Hêrs xwesteka desthilatdariyê di dilê mirovan de xurt dike û wan ji xwezaya wan dûr dixe. Ji bo mirov nebin hêsîrên hêrsên xwe, divê berê xwe bidin berxwedêriyê; berxwedêrî, civakhezî û mirovhezî ye…

Mirovên berxwedêr pirsgirêkên civakê ji dil û can hîs dikin. Kirasê derxweşiyê li xwe dikin û ji bo nirxên mirovatiyê tev digerin.

Psîkolijiyê serê xwe bi hesta hêrsê re êşandiye û hinek nexweşiyên ruhî bi vê ve girêdaye. Her wiha edebiyatê xwestiye wê bi mirovan bide nasîn. Yek ji van berhemên edebiyatê pirtûka Tolstoy a bi navê 'Mirov Bi Çi Dijî' ye. Lehengê vê pirtûkê Sîmon, dora erdan xêz dike; heta rojava erdên dora wan xêz dike wê tev bibin yên wî. Ev ji bo me dibe ezmûnek li ser hêrsê. Çavên Sîmon bar nadin û hêrsa wî dibe kujerê wî. Peyama Tolstoy di vir de dide, pir pîroz e. Tolstoy bi awayekî aşkera nîşanî me dide ku hêrs dikare mirovan bike çi halî.

Gava mirov bi berxwedêrî nêzî xwe, nêzî civakê bibe wê hêrs bê kuştin; hêrs were kuştin wê dil û mejiyê mirov zelaltir bibe. Ruhê berxewedêriyê me bêtir nêzî heqîqetê dike. Hêviya min ew e ku di serî de hunermendên kurd, em dikaribin hêrsa dilê xwe bikujin û berê xwe bidin dilekî berxwedêr.

Mirovên bihêrs her tim hesûdiyê dikin û berê xwe didin Ehrîman lê heger berxwedêrî bi me re hebe em ê wekî Tolstoy dikaribin rêya mirovahiyê ronî bikin û dilê wan bi hezkirina mirovan tije bikin.

# Cayêko qedîmî ra merdimêko qedîm


Av. Cemile Turhalli




Ma cayêko wina tarîxî û qedîm ke xeylê medenîyetan rê wayîrî kerdo de operasyon nêwazenê. Ma wazenê ke pêrodayîş, şer û operasyonî na hereme ra dûrî bibî' nê qalan ra dima Tahîr Elçî binê Mînareya Çarlinge ame kiştiş

Bajaro qedîm merdimanê qadîman ano dinya. Qederê cayan qederê merdimî dîyar keno. Tahîr Elçî zî şaristanêk kan û qedîm yê Mezopotamya de ame dinya. Ziwanê ci zî ziwanêk tewr kehen bî. Kal û pîrê welatê ci raştê çend qirkerdişan ameyî û înan ser de koçkerdiş ame ferzkerdene. Kam se vano wa vajo welat zehf şîrîn o. Ne qirkerdiş û ne zî ters eşkenê merdiman welatê xo ra dûrî bikerê.

Kek Tahîr zî welatê xo de merdimêk welatparêz bî. Ziwanê dayika xo ra zehf heskerdêne. Hertim zimanê xo qalî kerdêne û qalîkerdişê ziwanê xo ra zehf heskerdêne. Labelê çi heyfo ke ziwanê ci qedexe bî. Bindestîya zimanê xo qet qebul nêkerdêne. Coka ra sey kal û pîranê xo serewedartox bî. Serewedartoxî timî kewto para kurdan. Serewedartoxîya ci o kerd raywanê rayîrê heqîqetî. No raywan timî heqîqatî gêra. Hewnanê xo de daxî bi ziwanê xo qisey kerdêne la wexto ke şîyêne mekteb nêeşkayêne ziwanê xo qalî bikero. Coka ra nêwaştêne ke şêro mekteb û bêzerrî mektebê xo qedêna. Dima ra zî dest bi gure kerd.

Tahîr Elçî meslekê xo nêweçîna. Gure zî ge-ge beno qederê merdiman. Tahîr Elçî mecburî bî avûkat. Heta peynîya emrê xo hetê heqê merdiman de xebatî rayîr berdî. Destpêkê serranê 1990an ra heta 2015an yanî heta mergê xo semedê heqîqat û edaletî vengê xo berz kerd. Welatê xo de qirkerdişê merdiman û cezanêkerdişê merdiman qebul nêkerd. Coka ra timî şîyêne nînan ser o. Zanayêne ke bê edalet aştîye nêbeno. Vengê ci tena semedê merdiman berz nêbî. Waştêne vengê her tewir gandaran berz bikero. Zanayêne ke ganîbîyayîş tena yê merdiman nîyo. Ganîbîyayîş pêroyê tebîetî keno xo mîyan. Heqê darêk ra heta heqê mirçikêk heqê pêroyê gandaran seyyewbînan o. Tarîx zî parçeyê tebîetî yo.

Kek Tahîr timî waştêne rakewo. Çimkî hewnanê xo de azad bî û bi asanî ziwanê xo xeber dayêne. Na reye hewnê xo de Mînareya Çarlinge dîye. Çiqas zerrîya ci teng bibeyêne şîyêne Mînareya Çarlinge. Kursîya xo eştêne kişta linganê Mînareya Çarlinge û çaya xo ya qaçaxe şimitêne û tereqnayêne. Timî goşdarîya qalanê Mînareya Çarlinge kerdêne. Hewnanê xo de kedênenê kerdêne nêeşkayêne vengê xo bi Mînareya Çarlinge bido eşnawitene. Peyîna peyîn fehm kerd ke goşê Mînareya Çarlinge bîyê ker. Çimê ci bîyê kor û nêşkena çar linganê xo ser de vindera.

Dima ra vengê Mînareya Çarlinge vejîya. Veng da kek Tahîrî û va; "Kek Tahîr emrê mi yê to ra xeylê derg o. Mi bawkalê to û bawkal bawkalê înan zî dîy. Heta nika mi çi dî çi nêdi emrê mi ra nêşî. Mi nê cayê qedîmî de roşan, veyve û mergî dîy. Eynî wext de mi pêrodayîşî zî dîy labelê heta ewro qet zerrîya mi nêbîye kul û kesêk mi rê çîyêko xirab nêvatibî. Nika zalimî bi tank, top û tifingan yenê mi ser o. Nê çend rojan de emrê mi bî çend hezar. Zerrîya mi bîya kul, çimê mi çîyê kor û destê mi lerizenê. Lingê mi êdî nêeşkenê xo ser o vinderê. Eke nê hêrişî nêqedîyê do lingê mi bişikê. Eke ez bikewa war do no bajar zî birijîyo. Ez nêwazena bi çimanê xo rijîyayîşê nê bajarî bivîna. Mi domanê nê bajarî taqîb kerdî, ê binê linganê mi ra şîyî û ameyî. Awe rote, asnaw kerde, binê linganê mi ra vazda û kayî kay kerdî. Nika nê domanî bê dayik û pî mendî. Ez zî bikewa war do tena û bêwayîr bimanî. Ez wazena înan rê biba veristî û moral. La ez nê venganê tank, top û tifingan ra bîya ker û lingê mi zî bîyê birîndar. Ez zana nameyê to nameyê heqîqatî yo û heq kam ca de bibo ti ewja de yî. Vengê heqîqatî her çî ra hîna berz o. Ez wazena ke ti na reye semedê mi û leyîranê mi vengê xo berz bikerî. Eke ti bêrî ez muteşekkir bena, eke ti nêrî zî ez nêeşkena to rê çîyêk vaja. Ez wazena ti bêvengîya mi bikerî berz û bikerî wesîleya aştîye. Nê bajarê qedîmî rê Elçî lazim o û o zî ti yî. Ez ha paweyê to ya."

Kek Tahîr cewabê xo da û va: "Mînareya Çarlinge. Zerrîa mi zî sey zerrîya to dejena. Heta mi ra bêro ez semedê to û leyîranê to vengê xo kena berz. Ez, to qet bêveng nêverdena. Leyîranê to zî bêwayîr nêverdena. Gere ti her tim serê çar linganê xo de bivindera, yew zî nêeşkeno hêrişê linganê to bikero. Ti gere nêmira. Eger yew bimiro va o merg zî nasîbê mi bibo."

Kek Tahir sozê xo ard ca, roja bîn tewrê embazanê xo şî binê Mînareya Çarlinge. Vengê xo kerd berz va: "Mînareya Çarlinge ma rê vana; zalimkaran da linganê mi ro. Mi çi pêrodayîş û felaketî dîy labelê heta nika mi îxanetêko wina pîl nêdî. Ez pêro merdimayîye rê vana. Dinya de eserêko bîno yê sey Mînareya Çarlinge çin o. Ma cayêko wina tarîxî û qedîm ke xeylê medenîyetan rê wayîrî kerdo de operasyon nêwazenê. Ma wazenê ke pêrodayîş, şer û operasyonî na hereme ra dûrî bibî."

Hema qalîkerdişê xo nêqedînabî, vengê tifingan ame. Vengê tifingan vengê kek Tahîrî vînî kerd. Vengê tifingan nêverda vengê Tahîrî bibo berz.

Herkes vila bî labelê kek Tahîr tena binê linganê Mînareya Çarlinge de mend. Kek Tahîr nêverda wa guleyê tifingan bigino linganê Mînareya Çarlinge. Xo, semedê Mînareya Çarlinge û leyîranê ci kerd sîper û binê linganê Mînareya Çarlinge de kewt. Gunîya ey resaye linganê Mînareya Çarlinge. Seyî gunîya ey resaye lingan, mirçikêka sipîye peraye kifta serê Mînareya Çarlinge.

Mînareya Çarlinge hawar kerd û va: "Bêvengîya ma do bibeyêne mergê ma? Awa ma û gunîya ma do têmîyan bibeyêne. Ez bimerdêne mi to na rewşe de nêdîyêne."

Na reye vengê mirçike bî berz û va ": Merak mekere ez nêmerda. Meewne linganê xo, biewne ez ameya serê kiftanê to. Ez tîya ra pê bena pol û baskê to. Pêroyê dinya de se beno ez do xebara înan to rê bîyara. Ez do xebera leyiranê to to rê û yê to zî biba leyiranê to rê. Ez do her ca de vengê to rê biba veng. Ez tîya ra pê leyiranê to zî bêwayîr nêverdena." Dima ra mirçik firaye û şîye asmên.



## Çimeyê Munzurî bi betonan yenê talankerdene

Çimeyê Munzurî yê qezaya Pulurî yê Dêrsimî bi projeyê peyzajî yenê talankerdene. Rixmê heme nêrazîbîyayîşan xebatê ci dewam kenê. Çimeyanê Munzurî yê Pulurî yê Dêrsimî de yeno waştene ke projeyêkê peyzajî bêro kerdene. Sere de dêrsimijî xeylê hemwelatij û rêxistinî vera projeyî nêrazîbîyayîşê xo mojnenê. Şar û rêxistinî dîyar kenê ke Çimeyê Munzurî seba elewîyan cayêko fîraz o û nêwazenê ke Çimeyî bibê cayê rantî. Makînêyê karî Çimeyanê bimbarekan rijnenê û betonan rijnenê.

**Do pirdêk bêro viraştene**


Çimeyê Munzurî de binê nameyê 'viraştişê dorme' de beton ame rijnayene û kerrayê mermer ameyî cakerdene. Sê tebaxe de binê nameyê 'viraştişê dorme' de makînêyê karî kewtî Çimeyanê Munzurî û xebatê talankerdişî dîya destpêkerdene. Xebato ke dîya destpêkerdene hema zî dewam keno. Her çiqas ke xeylê herême û rêxistinanê komelkî yê sivîlî ra nêrazîbîyayîş bêro mojnayene zî proje bêmaben dewam keno û yeno pawitene ke serê Çimeyanê Munzurî de pirdêk bêro viraştene.

Sere de her çiqas ame vatene ke do 'cayê xozayî nêrî texrîbkerdene' zî rijnayîşê mîyanê Çirra Munzurî dewam keno. Nika zî betonê derg û kerrayê mermer ameyî cakerdene.

**Tehqîqatêk dîya destpêkerdene**

Çend roje verê bi vengdayîşê Heyetê Pawitişê Munzurî vera 'projeyê peyzajî' çalakîya zîncîrê merdiman amebî kerdene. 81 kesî tewrê çalakîye bibî. Serdozgerîya Komare ya Pulurî derheqê 81 çalakîkeran de tehqîqatêk daye destpêkerdene. ***DÊRSIM***

# Kapîtalîzm werdê ma reyde kay keno


Mahir Uzmez

Sîstemê ked-werdoxan mîyan de kapîtalîzm, herî peynîyê û herî bêwijdan o. Çimkî kapîtalîzm civak bêqewet û bêtakat verdeno.

Sermeyadarî her tim wazenê hukmê xo civak ser o berdewam bikerê, semedê eno berdewamîya xukmî zî şer, veyşanîye, feqîrî kenê qeder dekenê vernîya civakî. Eno sîyasetê înan zî merdiman hertim beno verva qedêneyîşî...

Meqsedê kapîtalîzmî tena karkerdin o, coka zî nirxê ke merdimayî heta enka dest nevistînê, dest fîneno.



Kapîtalîzm dest visto werdê ma zî. Hem zî werdê esasî nan, sewzî, zaxîre û heta goşt reyde zî kay keno.

Kapîtalîzm bi rayirê şirketê îlacan, şîrketê teknolojîyê weşîye û şîrketê sîgortayan, zincîrê xişnî yê citkarî û marketan; kedkaran, feqîrê dew û sukan girewtî binê destê xo û kontrol keno.

Kulturê werd û şimitişî kewto destê sermayeyê globalî. Sermayeyê globalî zî eno werdê ma destê xo de kerdo sîleh. Çend hebî mêrdimê ke merdimayîye ra vecîyayê eno sermeyeyê globalî reyde merdimayî girewto binê kontrolê xo.

Enê serranê peyênan de semedê Endûstirîyalîzmî, werdê linga ser o vera bi milyonan merdim nêweş kewtî. Yew cay ra, bi weşîbîyayîşê global endûstirî yê beşa werdî de, hûmara nêweşîya obezîte (Qelewbîyayîş) zaf bîya, cayo bîn ra zî veyşanîye û feqîrî vêşî bîyê.

Ewro dinya de 800 milyon merdim veyşano, polo bîn de zî 1 milyar 200 milyon merdiman de zî nêweşîya obezîte esta.


Rewşa dinya enawa miyan de nakokî de ya, labelê Tirkîya de rewşe senîn a? Werdê ke ma rojane wenê çiqas baş o û semedê weşîya merdimî çi feydê xo esto?

Greenpace Akdenîzî, Tirkîya de sewzî yo ke heze fringî, îsot û xiyarê ke yeno rotin ser o yew rapor eşkere kerd. Namê raporê; Tahlukeya ser sofrê ma: Pestîsît o. Raporê Greenpeace de yeno vatene ke 90 hebî sewzîyan ser de cigêrayîş ameyo kerdene. Eno 90 heb sewzîyan mîyan de 14 sewzîyan de maddeyê Pestîsîtê, 46 hebi mîyan de zî pestîsîtê ke ser hormonê merdiman ser o de zirarê ci esto ameyo tespîtkerdene.

Raporê Greenpeacê bal anceno serê yewna babete û vano ke; maddeyê kîmyewî yê ke terafê sazîyê Weşîya Cîhan ameyo qedexekerdene bi rayîrê eno şîrketê globalan dekeweno sofrê ma mîyan û ma bi destanê xo eno jehr danê gedanê xo. Eno werdê ka ma rojane kar anî mîyan de endî jehr esto, lazimo ma semedê enê jehrî tedbîr bigêrê.

Tedbîrê enê karî, yan zî eno jehr ke ma rojane wenê, werdê xozayî yo. Eke ma zî heze ma û pîyê xo yan zî heze dapîr û bapîrê xo werdê xozayî biwerê hem emrê ma vêşî beno, him zî nêweşîya wextê kapîtalîzmê heze obezîte nêbeno belayê serrê ma. Eke dewa şima esta se, wext vinî mekî şêrê dewa xo.

Xo rê çand heywanan bigirî û çand donima erd biramî mebî koleyê Kapitalîzmî...




# Ew bavê xwediyê xwe ye

Beriya makîne derên, mirovan kar û şixulên xwe, bi hêz û qeweta mirov û sewalan dikirin. Di nav sewalan de yên herî zêde kar bi wan dibûn û barê mirovan sivik dikirin, ga bûn. Ga, hem sewalek zexim e, hem miskîn e û hem jî bi kêrî pir karan tê. Yanî mala gayê wê hebe, ew mal serwext e. Ji ber wê yekê çi dibe bila bibe divê gayê malê hebe.

Demekê mêrikek dixwaze ji xwe re gayekî bistîne. Bi pirs û pirsiyaran saloxê gayekî firotinê dibihîze û berê xwe dide mala xwediyê wî. Piştî hevdîtinê, dor tê ser meseleya kirîn û firotina gayî lê li gorî rêz û rismê; kesê bikir be, ji bo tiştê dikire baş nas bike pirsan ji xwediyê wî dike û ew jî rastiyê jê re dibêje. (Mixabin her kesî rast nedigot)

Bikir, dest bi pirsên xwe dike:

-Kekê, tu dizanî divê ez kurm û tebîetê gayî bizanibim ku li gorî wê pê re miameleyê bikim!

-Kerem bike kekê! Pirs ji te û bersiv jî ji min.

-Cot bi gayê te dibe?

-Na weleh!

-Gêle pê dibe?

-Na weleh!

-Gayê te têrê hildigire?

-Na weleh!

-Gayê te erebeyê dikişîne?

-Na weleh!

-Gayê te ji tovî re dibe?

-Na weleh!

-Êêê kekê, wê demê ji mozê re çawa ye?

(moz havînê bi dewaran vedidin û ew ji ber mozan diteriqin diçin)

-Ahaa jixwe te yê ev bipirsiya! Ji mozê re bavê xwediyê xwe ye! Tu dewar xwe nagihîne toza wî!

Îca dema niha mirov guhdariya hinek kurdên me dike, tam vê rewşê dibîne. Camêr bi kêrî hilgirtina çekê û şer nayên; bi kêrî siyaseteke serkeftî nayên ku bêne bijartin û bi rêya siyasetê çareseriyekê bînin. Bi wan nabe ku saziyên sivîl ava bikin û ji vî alî ve dagirkeran hinekî biêşînin. Bi kêrî sazûmankariya dezgehên zimên û çandê ava bikin û li hemberî bişaftinê bibin bendav û ziman vejînin jî nayên. Nikarin lijneyeke aştî û çareseriyê jî ava bikin ji bo di navbera parçe û partiyên Kurdistanê de bibin pira danûstandinê.

Lê belê ji dijûn û sixêfan re, ji bêbextî û îftirayan re, ji pêkanîna nîfaqa di navbera kurdan re "bavê xwediyê xwe ne."

***A. Azîz Aksû***

# Tiştanok (mamik)

Berê di civat û şevbihêrkan de gelek caran ev tiştanok dihatin pirsîn û bersivandin. Kesê ku pirsa xwe dikir bi vê hevokê dest pê dikir û digot: Tiştek min heye ………. kî dizane ew çi ye?

De ka îro jî em van 3 tiştanokan ji we hêjayan bipirsin.

Gelo kî dizane bersiva van tiştanokan bide?

**1-** Sê pênc pazdeh û dido hevdeh û sisê bîst, dike çend.

**2-** Hem hema ber çeman ne gur dixwe ne diz dibe.

**3-** Bi hewa re difire, perê wê tune; wekî şekir e lê tama wê tune.

**Bersivên me ev in:**

**1-** Bîst **2-** Aş **3-** Berf



# Zûgotinok

→ Kî dikare 3 caran li ser hev bêje?
**Rûvî li rê zivirî, rê li rûvî zivirî.**

→ Heke ew çênebû vê biceribîne.
**Pişk û mişk di qolê de**
**Min pişk xwar û mişk ma tê de**

→ Heke ew jî çênebû wê teqez ev çêbibe, sê caran bêje:
**Heft teşt mişt nîsk**

→Ew jî nebû vê bêje:
**Min tiliya xwe da qijikê, got "qij". Qijikê berê xwe da min, min got "qij".**



# XAÇEPIRS

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 2 | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | 3 | | 4 | ■ |
| | ■ | | ■ | ■ | 5 | | | | ■ | | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | 7 | | 8 | ■ | ■ |
| 9 | 10 | | | 11 | | ■ | | ■ | | ■ | ■ |
| ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | 12 | | | 13 | ■ |
| 14 | | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ |
| | ■ | ■ | 15 | | 16 | | | | ■ | | ■ |
| 17 | | ■ | ■ | ■ | | ■ | | ■ | ■ | 18 | 19 |
| | ■ | ■ | 20 | ■ | | ■ | ■ | 21 | ■ | ■ | |
| | ■ | 22 | | | | 23 | | | ■ | ■ | |
| | ■ | ■ | | ■ | ■ | | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |

JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Xebat, berhema karê mirov
3. Navê koka gelên ku kurd û faris jî di nav de ne
5. Çewt, şaş, beradayî 6. Hal 7. Peyman, ehd 9. Hêşînayî, giya
12. Ne tarî 14. Ji bo ku, ji ber ku 15. Candar, giyanewer
17. Cînavkeke pirhejmar 18. Bersiva neyênî
22. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê

JI JOR BER BI JÊR

1. Îş, xebat
2. Koşk, eywan, qesir
3. Cihê ku genim lê tê hêrandin
4. Rojeke hefteyê
5. Reşayî, ne ronahî
7. Serok, serkêş
8. Evîndara Memê Alan
10. Pêxemberek
11. Dînbûn, nehsî, ne tebatî
13. Bawerî
14. Çerxa zeman
16. Ana, anha, di vê kêliyê de
19. Arvan
20. Alaveke erdkolanê
21. Cejin
23. Jina ku hevserê wê dimire

Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 M | A | 2 R | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | 3 T | O | 4 R | ■ |
| I | ■ | O | ■ | ■ | 5 H | E | M | Û | ■ | E | ■ |
| 6 J | Î | J | O | ■ | E | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | D | ■ | ■ | R | ■ | 7 D | O | 8 T | ■ | ■ |
| 9 A | 10 R | A | S | 11 T | E | ■ | O | ■ | O | ■ | ■ |
| ■ | I | ■ | ■ | A | ■ | ■ | 12 M | A | N | 13 Î | ■ |
| 14 E | M | ■ | ■ | J | ■ | ■ | A | ■ | ■ | R | ■ |
| R | ■ | ■ | 15 B | Î | 16 N | A | H | Î | ■ | A | ■ |
| 17 M | Î | ■ | ■ | ■ | E | ■ | Î | ■ | ■ | 18 N | 19 A |
| E | ■ | ■ | 20 Ş | ■ | W | ■ | ■ | 21 A | ■ | ■ | N |
| N | ■ | 22 S | E | R | A | 23 S | E | R | ■ | ■ | Î |
| Î | ■ | ■ | R | ■ | ■ | Î | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |

# Bîranîna Cergerxwîn bû sedema yekrêziyê

Navenda Nûçeyan

Di 22-10-2020'î de anku di roja salvegera koçkirina Seydayê Cegerxwîn a 36'emîn de, li bajarê Qamişloyê Bexçeyê Xwendinê bîranîna seydayê helbesta kurdî hate lidarxistin. Ev çalakî bi tevlêbûn û hevkariya 4 saziyên çand û hunerê yên rojavayê Kurdistanê hate organîzekirin.

Saziyên beşdarî amadekariyên vê xebatê bûne ev in: Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK), Yekitiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê, Yekitiya Nivîskarên Kurd Li Sûriya û Yekitiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê.

Ji hemû aliyan ve mirov dikare bêje ku ev çalakiyeke gelekî watedar û hêja ye. Ji aliyekî ve, cihê lê hatiye lidarxistin Qamişlo ye û Qamişlo ji bo seydayê Cegerxwîn bajarê ku di ciwaniya wî de ew hembêz kiribû û bûbû hêlîna jiyana wî û piştî ku koça dawî jî kir dîsa bû mala ebedî ya bedena wî.

**Cudahiya çalakiya îsal**


Aliyê din ê herî girîng jî ew e ku di vê demê de, ji her demê bêtir hewcedariya kurdan bi yekrêzî û yekitiyê heye, di bîranîna îsal de çar saziyên kurdan ên çand û huner û wêjeyê bi hev re ev bîranîn kirin. Ne wekî berê ku her saziyek bi serê xwe li dar dixist lê çar saziyên kurd bi hev re ev bîranîn li dar xistin.

Li aliyê din, lidarxistina vê çalakiyê li Bexçeyê Xwendinê jî bêguman dê rewanê seyda şad bike ji ber ku her digot xwendin û xwendin:

*xwendin nebe kes naçe pêş*
*peyda dibin pir derd û êş*


Ez bawer im ku vê demê, wê rewanê Cegerxwîn jî li Bexçeyê Xwendinê bi dengê helbestan re, li ser ezmanê Qamişloka Evînê bi kêfxweşî bifire û vê helbesta xwe ji we re bixwîne.

Kî me ez?
Ez im rojhilat
Tev birc û kelat
Tev bajar û gund
Tev zinar û lat
Ji destê dijmin:
Dijminê xwînxwar
Xurt û koledar
Ji rom, ji fireng
Di rojên pir teng
Bi kuştin û ceng
Parast, parast
Parast min ev rojhilat
Kî me ez?
Kurdê serfiraz
Dijminê dijmin
Dostê haştîxwaz
Ez xweş mirov im
Ne hirç û hov im
Lê çibkim bê şer
Dijmin naçe der
Bav û kalê min
Dijîn tev serbest
Naxwazin bijîm
Ta ebed bindest




## 'Şerma mêşê' li çîrokên kurdî zêde bû

Navenda Nûçeyan




Mehmet Çakmak bi pirtûka xwe ya 'Şerma Mêşê', pirtûkek din li çîrokên kurdî zêde kir. Pirtûk ji 130 rûpelan pêk tê û ji aliyê weşanên Payîzê ve hatiye çapkirin.

Pirtûka Mehmet Çakmak bi tevahî ji 11 kurteçîrokan pêk tê. Ev pirtûk berhema Mehmet Çakmak ya sêyemîn e. Temaya çîrokên di Şerma Mêşê de cih digirin, zêdetir ji karakterên ku xwe li keviya jiyanê girtine û îdiaya wan a mezin tune ye pêk tê. Her çi qas di çîrokan de bûyerên gelek mezin nehatibin nivîsandin bixuyê jî em ferq dikin ku bûyer tu carî ji me dûr nîn in. Em bixwazin jî nexwazin jî bi awayekî em di navê de ne. Gelekên çîrokan li bajarê Amedê derbas dibin û di van çîrokan de bandor û resmê bûyerên ku qewimîne bi awayekî xwe didin der. Hin çîrok jî ji hûrgiliyên jiyana hundirîn, yanî ji girtîgehan hatine sêwirandin. Çîrokên girtîgehan zêdetir li ser kêliyên jiyanî radiwestin. Ew kêliyên ku êdî mirovên ji derve bêyî ku haya wan jê hebin dijîn.


Beşek ji Şerma Mêşê:

"Nema dizanîbû çi hest bike… Diviya bida dû wê kîn û rika wan salên dûdirêj, yan jî li bîranînên xwe yên zaroktiyê vegeriya û bi dilê xwe yê biçûk bavê xwe hembêz bikira. Li zilam nêrî, qet nedişibiya bavê wî ew kes. Mirovekî nexweş, lewaz, bêtevger li hember wî di xeweke nediyar de bû. Lê bavê wî yê di bîranan de, ew ê ku bi wê bejn û bala xwe ya tenik, bilind; ne ev kes bû."

## Ji weşanên Nûbiharê berhemeke hêja

Navenda Nûçeyan

Ev berhema hêja beriya 400 salan ji aliyê zimannasê kurd Mele Eliyê Termaxî ve hatiye nivîsandin. Pirtûk wekî yekemîn gramera kurdî ya kurmancî tê binavkirin. Ev berhema qaîdeyên gramera erebî digel farisî destnîşan dike, paşê jî kurmancî dide ber wan. Berhem ji aliyê weşanxaneya Nûbiharê ve bi navê Tefsîra Termaxî hatiye çapkirin.




Hêjayî gotinê ye ku beriya niha pirtûka Mele Mehmûdê Bazîdî ya qaîdeyên ziman ji weşanên Weqfa Mezopotamyayê derketibû.

Her çend yekemîn rêzimana kurmancî, ya Elî Teremaxî (1590) be jî lê wisa xuya ye cara pêşî xebata ku tenê ji bo rêzimana kurmancî û bi zimanê kurmancî hatiye kirin, xebata Bazîdî ya hêja ye.



Samî Hêzil

## Sînorê rexneyê

Rexne wek têgeh di jiyana me de bi têra xwe cih digire. Di piraniya têkiliyên me de, çi devkî, çi nivîskî çi jî dîtbarî bi sûretên cur bi cur xuya dibe. Rexne geh bi gotinên sivik, geh jî bi helwestên tund û acizker çêdibe lê carinan jî sedî sed mafdar e û hema rastiyê ji nîveka pirtûkê dixwîne. Der barê etîmolojiya rexneyê de hin angaşt hene, ji rah-ne ya farisî bigire ta watedayînên cuda yên têkildarî bi koka 'rex'ê û parçeya 'ne' yê. Vêca em kurd di qada onomastîk de pir serkeftî ne û zûka têkiliyeke çîrokî ji bo peyvekê dibînin! Helbet ev jî şêwazek e. Tişta ku di peyva rexneyê de min aciz dike dengê 'x'yê ya tam li nîveka peyvê ye. Peyvên bi "x"yê dest pê dikin an jî bi vê dengê diqedin, wek mînak peyvên xwezî, ax û yên din xwedî awazeke xweşik in, li dema di nîvekê de be ew deng wek frenê ji mirov re astengiyekê çêdike.

Her ji ber çi be jî peyva rexneyê li ser mirov hîseke neyînî çêdike. Helbet rexne ji hêla mantiqî û semantîk ve, wek dijbera pesn û pîroziyê, di xwe de wateya neyînîkirinê dihewîne. Belkî jî ji ber vê bandora neyînî ya vê têgehê ye ku li her dewrê timî ji bo rexneyê daxwaza sînordayînê çêbûye, gelek sînor jî hatine danîn û têgeh bêtir bi sînorên xwe hatiye ravekirin. Wek tê zanîn, di nav demê re, ji aliyekê ve hin sînor ji holê rabûne û di pey re jî sînorên nû çêbûne. Di mijara sînorî de jî zêdetir li ser mijarên ku rexneya wan nabe hatiye rawestîn. Tabûyên rexneyê çêbûne. Di vê nuqteyê de mirov dikare li ser têkiliya rexne û şîroveyê bisekine. Gelo nebe ku şîrove ji bo sistkirina derbendiya pêş rexnekirinê îcat bûbe! An jî berovajiyê vê, rexne ji ber bêzarbûna ji kubariya şîroveyê wek bertek derketibe holê an jî wateya wê ber bi wê hêlê ve guherîbe?

Hêla rexneyê bi giştî ber bi derve ye lê nerîteke xwe-rexnekirinê jî bêguman heye û wek çandeke hevpar a mirovahiyê li seranserê dîrokê û di gelek bawerî, fikr û îdeolojiyan de jî tê dîtin. Her çi qas li gor cureyên din ên rexneyê pêkanîna vî şiklê rexneyê di pratîkê de dijwar be jî sûdbexşî û erkên wê gelek in. Dawiya dawî, xwe-rexnekirin wek fonksiyon, hevgirêdana endam/takekes a bi gewdeya mezin a sazî, rêxistin an jî baweriya tam ji nû ve saz dike. Hokareke din a ku sînorê rexneyê kifşe dike helwesta rexneyî ye. Helwesta rexneyî bi cureyên rexneyê yên wek; rexneya estetîk, rexneya mantiqî, rexneya ezmûnî, rexneya erênî û rexneya neyînî, rexneya avaker û rexneya xirabker, rexneya teorîk û rexneya pratîk ji hev tên cudakirin. Her wisa rexne li gor ku ji raya giştî re vekirî be yan ku xwedî xasyeteke giştî be an jî rexneyeke taybet û girtî be; rexneyeke tundraw be an jî yeke girêdayî kevneşopiyê be; rexneyeke akademîk be an jî yeke populer be jî tê senifandin.

Yek ji qadên ku rexne tê de populer e bêguman qada wêjeyê ye. Di wêjeyê de jî hebûn û nebûna sînorê rexneyê tê nîqaşkirin. Rexneya estetîk ji bo wêjeyê helwesta rexneyî ya herî guncav e, her ku ew girîngiyê dide bedewiyê û li ser xalên wek şikl û naverokê, wate û sêwirana estetîk û kompozîsyona berhemê disekine. Rexnekar di karên xwe yên dahûrîna berheman de herî zêde pêşekiyê didin navgînên rexneya estetîk lê hin caran ji ber sedemên cuda rexneya wan bêtir dirûvê rexneyeke erênî an jî neyînî digire. Belkî jî rindî û nerindî an jî pejirandin an jî nepejirandin reftara me ya sereke ye di nirxandina tişteke estetîk de. Lewma em zûka dixwazin mohra baş an jî ya nebaş li tiştekê bidin û berteka xwe jî wek çêker an jî xirabker kifşe bikin.

Ji bo wêjeya kurdî gelek caran behsa lawaziya rexneyê tê kirin û nebûna rexneyeke têr û tijî wek sedema gelek kêmasiyan tê nîşandan. Mixabin nîqaşên di vî warî de ji destnîşankirina kêmasiyekê wêdetir naçin û nêrînên kûr û argumanên xurt zêde nayên rojevê. Rast e ku rexneyeke sîstemîk ji bo edebiyata me pêwîstiyeke sereke ye lê gelo me bingeheke felsefî, rewiştî û madî çêkiriye jî bo sîstemeke rexneya xweserê xwe? Lêkolînên dîroka wêjeyê, diyarkirina pêşekiyên rexneyê, cudakirina serdem û qadan tev wek barên teorîk li benda lêkolîneran in. Reng e ku hîs, daxwaz û pêwîstiya rexneyê ji bo her dewrê derbasdar bûbe. Li her yek serdema wêjeya kurdî, helwesta têkildarî rexneyê bêguman xweserê dema xwe ye, lewre der barê hûrgiliyên vê meselê de pisporên wêjeya gelêrî, ya klasîk û nûjen dikarin rexneya hundirî ya serdemê û derfetên rexnekirinê yên li dema îro - bêyî ku bikevin nav kemîna anakronîzmê- destnîşan bikin. Her wisa pirsa 'sînorên me yê rexneyê çi ne?' jî wek pirseke esasî hêjayî nirxandinê ye.

Helwesteke rexneyê heye ku jê re 'rexneya ji bo rexneyê' tê gotin. Gelek fikrên dijber û alîgir hene der barê vê helwesta rexneyî de. Di vir de rêgeza esasî helwesta mişt rexnekarî ye. Gelo nebe ku di nav hişmendiya me ya kurdan a populer de, sibê tevgerek wek rexnekariya sînornenas derkeve pêş -a rastî ew helwest li xasyeta me kurdan jî tê- û ew tevger hemû sînorên heyî ji holê rake û jiyana me ya fikrî û çandî serûbin bike. Dîsa jî divê em qebûl bikin ku di nav çanda me de şêweyek rexneya avaker jî heye ku bi qalibeke gotinê yê wek 'birê min wisa nabe, te yê wiha bikira!' dikare bê formulekirin.

xwebûn

26 Cotmeh-1 Mijdar 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 45

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

DOSYA



Ardîn Dîren

Qewmê li pey azadî, nasname û zimanê xwe; amazîgh ango berberî-2

# Piştî rizgariyê li Cezayîrê çi diqewime?

Pêşeng û sempatîzanên FLN'ê li hemberî mêtingeriya Fransayê şerekî bêhempa kirin û di dawiyê de ew têk birin. Hemû dinya vê yekê dizane lê piştî ku FLN li Cezayîrê bû xwedî hêz, pergala fransiziyan ji xwe re mînak girtin û xwestin li ser vê pergalê hişmendiya xwe ava bikin.

Navê rejîma xwe kirin "Komara Gel a Demokratîk a Cezayîrê" û navê şêwaza birivebirina xwe jî kirin "Komara Sosyalîst" lê di encamê de hemû biryar di destê partiya FLN'ê de bûn û wê çi biryar bida, di fermiyetê de ew derbas dibû. Der barê birêvebirina hikûmetê ango sazkirina dewletê de pir qels bûn û hema bêje serê xwe qet bi vê mijarê re neêşandibûn. Plansaziyek berfireh amade nekiribûn. Ji lewma xwestin bi pergala heyî bidomînin. Modela ku berê ew li hember disekinîn û şer dikirin pejirandin û xwestin civak jî hînî vê modelê bibe û bipejirîne. Şêwaza jiyanê ya dixwestin li Cezayîrê bi cih bibe, şêwaza jiyana fransiziyan bixwe bû.

**Fransiziyên herêmî**

Belê rast e, fransiziyan Cezayîr terikandin çûn lê di cihê wan de vê carê 'fransiziyên herêmî' derketin holê ku tu cudahiya wan ji yên berê tune bû. Wek ku di çîroka jorê de jî heye, ji jor de li civakê nêrîn û bi awakî kirêt xwestin gel bextewar bikin. Nêrîneke qure ya serdest peyda bû li Cezayîrê. Mixabin hêz û otorîte ev hişmendî ava dikir. FLN bi vê nêzîkatî û hişmendiya xwe dest bi xebatê kir. Beriya ew bixebitin û biafirînin bi darbeya leşkerî xwestin her kes heman tiştî bifikire û azadî binpê kirin. Bi hizra jakobenîzma fransiziyan tevgeriyan û xwestin li Cezayîrê netewe-dewleteke bi vî rengî saz bikin. Bi biryar û destûra bingehîn gelê ereb wek serdest nîşan dan; berberiyan û zimanê wan biçûk dîtin; di fermiyetê de tenê zimanê erebî pejirandin. Dînê îslamê di ser hemû dînên din re dîtin; xiristiyan û cihû tune hesibandin. Mafên mirovan, bi taybetî yên jinan binpê kirin. Gelek rojnameger hatin girtin û kuştin; rê li ber çapemeniya azad hate girtin. Nivîskarên dijberî wan ji ber şert û mercan mecbûr man birevin derveyî welêt. Mirov dikare bibêje ku bi her awayî wan xwe şiband desthilatdarê xwe û ew di rêçika wan de meşiyan.

Ew roj û îro ye, li Cezayîrê bingehek xurt a azadiyê çênebûye. Pirsgirêkên sereke nehatine çareserkirin, jixwe Cezayîr ji darbeyên leşkerî nikaribûye serê xwe rake heta ku van pirsgirêkên xwe çareser bike û bi wan re mijûl bibe! Wek mînak, kesên heta niha serokwezîriya Cezayîrê kirine tev leşker in. Heya salên 1990'î jî ji xeynî FLN'ê partiyeke din, raman û nêrîneke din nehatiye pejirandin.

**Endamên FLN'ê hatin girtin**

Hêj di destpêkê de ev tişt diqewimin. Piştî van nêzîkatiyan kesên ku bi salan di eniya FLN'ê de xebitîn û şer kiribûn bertek nîşan dan û ji FLN'ê veqetiyan. Eniya FLN'ê kesên mîna Hocine Aid-Ahmed û Muhammed Harbî bi çepgirî û şoreşgeriyê tawanbar kirin û ew dîl girtin. Gelek kadro û pêşengên FLN'ê yên dixwestin pergalek şoreşgerî ava bikin hatin girtin û di girtîgehan de îşkenceyên ji yên fransiziyan xerabtir li wan kirin. Gelek ji wan kesan seqet man, hinek ji wan bi salan di girtîgehan de man û hinek ji wan jî firar kirin çûn derveyî welêt. Divê mirov bi bîr bîne ku ev pêşengên FLN'ê yên hatin girtin, ew kes bûn ku di ciwaniya xwe de cara ewil bankayan bi dest xistin û xwestin ev banka bikevin bin xizmeta gel lê piştî şerê rizgariya neteweyî bi carekê ev pêşeng hatin sûcdarkirin. Kesên wek Muhammed Boudiaf, Hocine Aid-Ahmed û Ben-Bella mecbûr man ku birevin derveyî welêt an na ew ê jî wek hevalên xwe yên çepgir bihatana dîlgirtin an jî kuştin. FLN'ê bi vî awayî roj bi roj kesên fikrên azadiyê dihebandin ji xwe dûr xistin û ew bi nêrîneke çewt bêtir li gor dînê îslamê tevgeriya. Piştî vê nêzîkatiya FLN'ê her çû alozî kûrtir bû li Cezayîrê.

**Serdestiya leşkerî**

Bi kurtasî dîktatoriyek çûbû û dîktatoriyeke din hatibû û dewleta Cezayîrê bû dewleta FLN'ê! Di sala 1964'an de Humeyri Bumedyan bi darbeyeke leşkerî xwe wek serokwezîr îlan dike û rûyê xwe yê tund nîşan dide. Piştî vê darbeya leşkerî di hemû qadên dewletê de burokrasiyeke nebaş derdikeve holê û ev burokrasî azadiya civakê ji holê radike. Serdestiyeke leşkerî xwe nîşan dide û her wiha 'baron' û 'şef'ên nû peyda dibin. Ev kes an jî kom heval û hogirên xwe li dora xwe dicivînin û pergala bertîlê ava dikin. Tiştên ne di rê de peyda bûn. Ev tiştên hanê wek çandekê roj bi roj mayînde bûn. Hemû hikûmet (peyva hikûmetê jî çiqas rast e nizanim, ji ber ku hilbijartinên hatine kirin jî tev formalîte bûne, artêş kî hilbijartiye ew bûye serokwezîr) bi vê pergalê berdewam kirin û piştî rizgariyê li Cezayîrê ji bo berjewendiyên civakê tiştekî baş neqewimî; ji xeynî dizî, bertîl û darbeyên leşkerî.

**Bertîl wek werzîşa neteweyî ye!**

Divê neyê jibîrkirin ku li vî welatî du tiştên sereke hene ku qet neguherîne û naguherin jî; yek hêza leşkerî ya li ser civakê, ya din jî bertîl e.

Çanda bertîlê li vî welatî wek 'werzîşa neteweyî' tê binavkirin. Ji serî heta binî, ji biçûkan bigire heya mezinan, ji saziyên biçûk bigire heya serokwezîran ev 'werzîşa neteweyî' bi cidiyeteke mezin pêk tê. Ji dema fransiziyan heya îro rewş wiha ye. Mirov dikare bibêje ku dîroka Cezayîrê dîroka bertîlê ye.

Hêza artêşê jî qet naguhere. Hêza kî têrî çi kiriye, efû nekiriye û jê bêpar nemaye; bi taybetî jî bertîla navneteweyî navdar e. Ji lewma Cezayîr ji hêla hilberînê ve gelekî qels e û ew bi gelek tiştên xwe girêdayî derve ye.

Piştî şerê rizgariya neteweyî, ji ber xirecira ew ê kî çi qas bixwe dem nedîtine ku plansaziyeke hilberînê çêbikin. Her tişt ji derve hatiye. Ev jî rê li ber simsarên bertîlê vekiriye û ev simsar ji bo her tiştî bertîlên mezin distînin. Ev simsar ango baronên bertîlê bi saya artêşa neteweyî Cezayîrê bi rê ve dibin. Yanî gava vê yekê dikin di fermiyetê de jî li hev tînin.

**Tiştek zêde neguheriye**

Dîsa tiliyên dewletên biyanî jî di vî karî de hene û her wiha berjewendiyên wan ên li ser çavkaniyên binerdê yên Cezayîrê gelek in. Rastî ev e lê ya xerab ew e ku her tim yên li ser kar, xwedî hêz û berpirsiyarên mezin vê werzîşê bi serkeftî pêk anîne û yên mayî jî di nav xizanî û birçîbûnê de gevizîne. Petrol û gaza Cezayîrê dikare ji bo hemû cezayîriyan jiyaneke bêhempa û biqelîte ava bike lê mixabin ev baronên bertîlê rê nadinê. Afirînerî û hilberînerî qet tune ye. Ji derve çi were ew tê bikaranîn û hew. Niha jî heman tişt derbasdar e. Tiştek zêde neguheriye. Her çiqas wek berê nîn be jî bertîl di meriyetê de ye û artêş xwedî hêz û aboriyeke mezin e li Cezayîrê. Ji ber vê yekê hilbijartin jî birêvebirin jî qanûn û destûra bingehîn jî ango her tişt di destê artêşê de ye. Her çi qas bi awayekî sivîl hilbijartin çêbibin jî di rastiyê de artêş çi bixwaze ew e; biryara dawî ya artêşê ye!

Wek encam, her çi qas rê li ber partî û ramanên din hatibe vekirin jî di rastiyê de tiştekî bi vî rengî tune ye li Cezayîrê. Artêş dîsa hêza yekemîn a welat e û biryarên dawî ew dide. Heta roja îro jî hilbijartinên hatine kirin di bin siya artêşê de pêk hatine û bi vî awayî kes hatine hilbijartin.

Di navbera salên 1990 û 2000'î de gelek êrîş hatin kirin. Partiyên îslamî êrîşê amazîghiyan dikin û gelek kes tên kuştin. Di van salên dawiyê de her çi qas ev tişt pêk neyên jî ji hêla mafên mirovan, azadî û demokratîkbûnê ve pirsgirêkên mezin hene li Cezayîrê. Amazîgh ango berberî bi biryar in ku çand û zimanê wan were naskirin û ev rûyê Cezayîrê yê reş were guhertin. Ji bo vê îro jî xwepêşandanên wan berdewam in û ji bo mafê xwe li ser piyan in. Li hemberî 'fransiziyên herêmî' disekinin û doza wekheviyê dikin. Tê gotin ku heger li Cezayîrê hêviyeke azadî û demokratîkbûnê hebe ev yek dê bi saya berberiyan pêk were. Ji lewma hewce ye mirov berberiyan cuda binirxîne. Bi salan e êrîş li wan tê kirin, tên bişaftin û kuştin; ew xwedî çîrokeke dûr û dirêj in. Ez ê hewl bidim di berdewama vê nivîsê de qala berberiyan ango qala amazîghiyan bikim.

## Serhildanên Nan

Di 30 salan de ku tenê FLN desthilatdar e, gelek bûyer diqewimin. Helbet hin kesên ku ev tişt didîtin û dizanibûn bêhelwest nîn bûn. Dixwestin dengê xwe bilind bikin lê artêşa Cezayîrê her tim gef li wan dixwarin û ew ditirsandin. Di van salan de gelek mirov tên kuştin; gelek kes tên girtin û gelek kes welat diterikînin lê bûyera herî girîng di sala 1988'an de diqewime.

IMF Cezayîr jî di bin deynan de hiştibû û bi vê yekê ve girêdayî li Cezayîrê buhayê her tiştî zêde bû. Mirov nikaribûn tiştên bingehîn bikirin. Serhildanên ku ji wan re digotin 'Serhildanên Nan' dest pê kirin. Xwepêşandanên mezin hatin lidarxistin lê di encamê de dîsa artêşa Cezayîrê derket meydanê û komkujî kir. Yên jiyana xwe ji dest dan bi taybetî ciwan bûn. Kesên hatin qetilkirin li kolanan hatin teşhîrkirin da ku çavê civakê bitirse û careke din tiştekî wisa nekin! Ev bûyer bû sedem ku êdî civaka Cezayîrê bi temamî ji FLN'ê dûr bikeve û li çareya serê xwe binêre. Jixwe piştî vê dîsa darbeyeke leşkerî tê kirin û heta salên 1990'î hikûmeta leşkerî Cezayîrê bi rê ve dibe.

## Tenê nav 'Komara Demokratîk' bû

Ji sala 1962'yan heya 1990'î rêveberî di destê FLN'ê de bû. Piştî 30 salan biryar didin ku partiyên din jî li Cezayîrê ava bibin. Piştî salên 1990'î partiyên FÎS (Eniya Îslamî ya Selametê), FFS (Eniya Hêzên Sosyalîst), HAMAS û RCD hatin damezirandin. Armanc ew bû, qaşo bi hilbijartinan xwe demokratîk nîşan bidin. Bi vê hincetê 'Konferansa Neteweyî ya Lihevhatinê' tê lidarxistin lê çi ecêb e FLN bixwe jî beşdarî vê konferansê nabe ji ber ku her kes baş dizanibû ev daxwaz ango konferans formalîte ye û dixwazin civakê bi vê konferansê bixapînin. Serokê FFS'ê Hocine Aid-Ahmed wiha digot, "Dixwazin otorîteyeke nû ava bikin û em ji bo vê derewê naxwazin bibin pirek. Heta ku dînê fermî yê komarê tenê îslam û zimanê wê jî tenê erebî be her çi qas navê vê komarê demokratîk be jî ew tu carî ji dil nabe demokratîk."

Ev partî ya amazîghiyan bû û dixwest mafên amazîghiyan jî bi qanûnan were parastin; ziman û çanda wan were naskirin lê li hember vê daxwazê bi tundî sekinîn û ev daxwaz nepejirandin. Amazîghiyan jî her tim hilbijartinên sexte boykot kirin û neçûn ser sindoqan.

